


# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



39  
1994

## **NAVEROK**

Kitêba M. Emin Bozarslan "Meyro" bî swêdi derket .....	3
Bona biranina hevalê min - <i>H. Garibyan</i> .....	4
Çend gotinêni bijarte .....	6
Varyanteki folklori yê "Mem û Zin"- Berhevkar: <i>A. Gernas</i> .....	7
Girîngiya muzika Folklori- <i>E. Muhemmed Ali</i> .....	12
Bî prof. Şekroyê Xudo ra hevpeyvin .....	16
Bî awireki kurt pîrsa asimilasyon, zimanparastin- zimangu hastinê û rewşa zimanê Kurdi- <i>Haluk Öztürk</i> ....	21
Çend Stranêni zarokan - <i>A. Gernas</i> .....	26
Tu zulm nikare emrê kolonyalizmê dîrêj bike - <i>B. Dersim</i> .....	29

**Sal: 15**

**Hejmar: 82, Heziran 1994**

**ISSN 0283-5355**

**KWEDI: KOMKAR-Swêd**

**BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN**

**NAVNIŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr  
161 36 STOCKHOLM

**TELEFON :** 08/ 26 23 75

**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska

Arbetarföreningen


**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş.BOTAN

**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.

161 36 STOCKHOLM

PIRTÜKA M. EMİN BOZARSALAN

# "Meyro" bı zimanê swêdi hat weşandin



Pirtûka niviskarê kurd Mehmed Emin Bozarslan "MEYRO" bı zimanê swêdi derket. Pirtûk berhevoka hikayetan e. Ew berê li Tîriyê û paşê li Swêdê du caran bı kurdi hatiye weşandin. "Meyro" ne tenê wek berhema Bozarslan ya pêsin, lê herwisa berhevoka hikayetên kurdi ya pêsin e ku bı zimanê swêdi hatiye neşirkirin.

"Meyro" jî aliyê Sureya Calli hatiye wergerandin û dî nav weşanên DENG (weşanxana niviskar bı xwe) da derketiye. Niviskarê swêdi Lars Bäckström jî pirtûkê ra pêşgotinek nivisiye.

Pışti derketûna "Meyro" çapemeniya swêdê bı awaki fire cih dane xeber û şirovekirinên derheqa pirtûkê da. Rojnamevan û niviskarên gelek rojnameyêñ mezin wek Svenska Dagbladet, Uppsala Tidningen û gelekên din, behsa xebat û xizmetên Bozarslan dikin û xasma salixê vê wergerê didin.

M. Emin Bozarslan bı xwe derbari weregera "Meyro" (bı swêdi: Malaria-amulett) da ji rojnamevanan ra weha dibêje:

- *Swêdi, hay ji rewşa gelê kurd ya siyasi û dijwar hene û dizanın, lê ewana derheqa sert û şeweyêñ jiyana kurdan, erf-adet û diroka wan da zêde tişt nizanın.*

Lewma niviskar "Meyro" daye wergerandin û

çapkırın. Bı rasti ji dî vi wari da kêmasiyêñ mezin hene. Dervayı çend hikayetên Mahmut Baksi û yên ku parekende dî hin rojname û kovaran da hatine belavkirin, û yek-du antolojiyêñ helbestvanêñ kurd (wek Şérko Bêkes), heta nuha gelek kêm nûmûneyêñ edebiyata kurdi bı zimanê swêdi hatine wergerandin û weşandin.

Wek tê zanin M. Emin Bozarslan jî 15 salan vîrda li Swêdê dîji û lî vêderê ji karê niviskariyê dîdomine. Dî warê dirok, ziman, wêje (edebiyat), diroka edebiyetê, rojnamevani, zargotin (edebiyata gel) çî wek niviskar, lêkolinevan û çî ji wek wergêr, Bozarslan xebatêñ geleki berfireh û hêja pêşkêşi literatura kurdi kîrine. Xızmetên Bozarslan bo çanda kurdi berdewam dike. Lî gor agahdariyêñ ku me ji mamosta M. Emin Bozarslan wergirtiye, "Mem û Zin" vê gavê dî çapê da ye û dî despêka sala 1995'an da wê jî nû va derkeve.

Pışti "Meyro", niviskar dixwaze hînek xebatêñ xwe yên mayin ji bı swêdi bide wergerandin û weşandin. Dî berdewamkirina van karân da, em ji niviskarê me yê hêja ra serfîraziyêñ nû dixwazin.

Xalit Lezgin

# Bona biranina hogirê min



Prof. Heciyê Cindi  
(1908-1990)

Jî bo biranina ulmdarê kurd ê bî nav û deng, niviskar û doktorê filologiyê profesor Heciyê Cindi em biranineke hevaleki wi yê ermeni H. Garibyan diwesinin. Wek xwendevan ji dizanin, Roja Nû beri nuha ji gelek caran li ser jiyan û xebatên zanayê kurd, emekdarê çanda kurdi, pispor û berhavkarê zargotina kurdi Heciyê GINDÎ nivisiye. H. Cindi yek ji wan mirovên mezin e ku wê di çand û diroka gelê kurd da herdem bê biranin. Vê carê em ê ji qel-ema hevaleki wi yê zarotiyê li ser salêñ zarotiya wi biraninekê bixwinin. Nivis ji rojnama R. Teze hatiye wergirtin.

Redaksiyona Roja Nû

Çendeki pêşda wefat bû emekdarê kultura me yê eyan Heciyê Cindi. Hetani nuha ji bî adrêsa mala wi û redaksiyona me telegram û name têne stendin, ku xwidiyên wan heyfa xwe tinun bona wefatbûna wi camêri. Em iro biranina ho-gireki H. CINDÎ neşir dikin.

(Redaksiyona R. Teze 19 Gulânê 1990)

Ciyê ku tu lê bûyi, tu wexta nayê jibirkurin. Ew ji meriyan ra dibe biranina heri şirin. İlahi wexta ji wir dûr i...

Ez û Heciyê Cindi wi çaxi hevra bûne nas, wexta turkên xwinxur li cimaeta ermeniya hatibûne xezebê, wextê reve-revê bû...

Ez ji, Heci ji, ji qeza Qersê ne. Ew dî gundê kurmanca Ermençayirê da ji diya xwe bûye, lê ez dî gundê ermeniya yê ciran Çırçiyê da bûme. Em herdu ji çawa dibêjin berxê salekê ne, dî sala 1908 'an da bûne. Em ne tenê berxê salekê bûn, lê usa ji qedera me herduya mina hev bû... Me nirê êtimxanê yê giran tevayı kişandiye. Em êtimên ti-birçi, digerian, bi roja birçi ancax me serê xwe xweyi dikir, ku



*Prof. Heciyê Cindi (li milê rastê) û du hevalên wi*

hingê bî sedan zarê hevsalêñ me dîmirin...

A wan çaxa bû ku lî şcherê Qersê çar êtimxane hatine vekirin. Em, gelek zarêñ mina me dî wan da star bûn... Teşkilatêd dîlrehmiyê digeriyan zarêñ mina me dianin dî wan êtimxana da ciwar dikirin. Lî ber derê êtimxana kuçikêñ mezin vêdixistin, zarêñ êtim dianin porê wan kurr dikirin. Gincirêd lî ser wan dêxistin û diavêtin nav wi kuçiki û dişewitandin. Paşê dibirin himamê û yeko-yeko av lî wana dikirin. Doxtora jî seri heta lingan ew dihêrin, paşê dibirin, dî nava nîvinê temiz da dîdane razandin. Jî ber ku ez û Heci bî emreki û bejnekê bûn, wana em herdu jî hev neqetandin.

Sibeturê em kîrîne cêrgê (rêzê) û yeki xeberda.

- Geli zara ez xudanê vê êtimxanê me, navê min Sedrak e, hûn dikarin gazi min bikin maqûl Sedrak. Lê ev hevalê han Hakob e, terbiyedarê we ye. Hûn gereke qedrê wi bigrin û gazikinê maqûl Hakob... Hûn dîvê tum weha bî cêrge bêne xwarinê- ewi got û da pêsiya me, em birine xwarinê.

Ez û Heci dî nivinekê da radizan. Kes nîzane me çiqas wede (zeman) rûyê nîvina temiz nedîtibû. Û şeva pêşin em tevayî mina mîriya ragan.

Rojtira mayin, mistir Yaro ê ji Amerikayê, ku serekê hemû êtimxanê bû, hate ba me. Ewi gelek temi (şiret) li me kîrin, gelek gotinêñ qenc jî me ra gotin. Maqûl Sedrak xebertana wi jî me ra tercume dikir.

Pey taştî em pareveyi ser koma kîrin. Ez û Heci dî koma yekê da dan rûniştandin. Dersdara me xanîm Duxikê bî destê xweyi mezin kok qayim li sûretê me dixist.

Heciyê zirekzehf zû hini zimanê ermeni bû. Ew, yeki bî aqîl û heyf bû. Lewma ji keseki destê xwe nedîda wi... Ewi gelek çirok zanibûn û me bî hewas guhdariya wi dikir. İlahi jî bira min naçe wextê ewi derheqa destê xweyi ku dî zendê da birri bû behs kir. Ap wi dışine ber dêwîr, ew lî çolê fişekî dibine, bî kêra cêva ya biçûk dixwaze serê fişekê derxe. Fişek dî destê wi da diteqe û dî zendê da tê bîrrin.

Rojekê ji elami me kîrin ku wê me bibîne Aleksandrapolê (Leninakana nuha). Çend roja şûnda em bî maşinê birin. Ez û Heci dî êtimxana pêncâ da bî ci kîrin. Xudanê êtimxana me maqûl Artaşêc bû, lê xudanê hemû êtimxana kulfeteke (jin) bêinsaf, bêxuda bû, navê wê Mêşin bû. Bona zareke ku nehî bikura, hemû zarok rojekê birçi dihiştin, xurekê wêrojê dîda kelba (se)... Lê lî himberi wê jîneke ameriki hebû, geleki bî rehm û heyf bû, ku mina deyîka helal ber bî me dîbû. Navê wê Mis Hilmêr bû.

Em heta koma hefta tevayî hin bûn. Paşê em jî hev vejetandin.

Pey salêñ dirêj ra, ku em jî hev qetiya bûn, disa rasti hev hatin. Heci êdi heciyê wan salan nebû... Ew meriveki ulmdar, nîvîskareki eyan bû...

H.GARİBYAN

# *Cend gotinên bijarte*

Ker bî barê pirtûkan tu wextê  
nabe Sokrates.

**GOTINEKE PÊŞİYAN YA  
SWÊDİ**

Mala bê pirtûk (kitab) wek  
cendekê bê rih e.

**MARCUS TULLIUS CICERO**

Kîtêba ku hêja nebe jî bo  
xwendîna du caran, ne hêjayî  
xwendîna carekê ye ji.

**KARL JULIUS WEBER**

Jî fanatizmê heya barbariyê ga-  
vek heye.

**DENIS DIDEROT**

Dema mîrov hay jî nezaniya  
xwe hebe, ew gaveke baş e berbî  
zaninê va.

**BENYAMIN DISRAELI**

Hemû şoreşan heta nuha tiştek  
isbat kîrine: ku gelek tişt xwe  
dîdîn guhurandin, lê tenê ne in-  
san.

**KARL MARX**

Serbest fikrin tişteki mezîn e, lê  
rast fikrin mezîntir e.

**THOMAS THORILD**

Ditîn (fîkîr) wek bîzmaran in.  
Kutana wan hêsa ye, kîşandîna  
wan zor e.

**ARNE HIRD MAN**

Hîn kes partiya xwe diguhêsin jî  
bo xatîrê baweriya xwe. Yêñ  
dîn baweriyê diguhêsin jî bo  
xatîrê partiya xwe.

**WINSTON CHURCHILL**

Rastiya ku em naxwazîn  
bîbihîsin, ya heri bî kîrhatî ye  
ku em lê guhdari bîkin.

**GOTINEKE PÊŞİYAN YA  
ÇİNİ**

Dereweke baş dikare jî Bexdayê  
bîçe Konstantinopelê, ku hîna  
rasti lî şimîkên xwe digere.

**GOTINEKE PÊŞİYAN YA  
EREBI**

Em orijinal têñ dînê, lî pîraniya  
me wek kopiya dîmirin.

**EDWARD YOUNG**

Fantazi jî zaninê gîringtir e.

**ALBERT EINSTEIN**

Ev nama han geleki dîrêj bû, lê  
tenê jî ber ku wextê min tunebû  
ez wê kurt bîkim.

**BLAISE PASCAL**

# MEM Ü ZİN

Diyarbekir folklorı

Ev varyant lı hêla Diyarbekir, ji ber devê **Fexriya Hesen** hatiye wergirtin. Çirok bı xwe varyantekî destana "Memê Alan" e û him bı çiroki him ji bi strani hatiye gotin. Bi taybeti besen strani rengeke dewlemend û xurt daye destanê. Gava meriv vê varyantê guhdari dike, hest û ditinên li ser cudabûna "Memê Alan" û "Mem ü Zin" a Ahmedê Xani cardın dertê pêş. Raya min bı xwe ji ew e ku, "Mem ü Zin" û "Memê Alan" ne eyni efsane ne û di nav xelkê da gelek têkeli hev bûne. Disa raya min ew e ku, "Memê Alan" zêtirli nav gel belav bûye. Cudahiya ev herdu efsaneyän mijareki taybeti ye û hewcedarê lêkolineki baş û tekûz e. Ez li vê derê tenê orijina vê varyanta folklori ya delal pêşkêş dikim.

## Berhevkar: A. Gernas

Carki ji cara,  
rehme li dê û bavê hazır û guhdara,  
ji xeyni şeytanê ber diwara.

Go, carki hebû Memê Alan û hebû Zinê. Milyaketa wan dîbir ba hevdu, dî xewna xwe da digihiştin hev. Memê serê sibê radibû, dînihêrt ku xewn e. Go, ecêba ev rast e, derew e, ez nîzanim ev çi ye, çi mesele ye. Carki, dudo, sisê..! Go rojeki disa milyaketan Zinê anibûn ser textê Memê. Pişti ku bı hevdu şa bûn, Zinê ji Memê ra got :

— Ez êdi hev têm. Ez gustilka xwe ji didime te. Herke tu têyi, welatê min bajarê Cizirê ye. Herke tu têyi li pey min were û ku tu nayı ez êdi hev têm ba te.

Go, ew şev ji heta serê sibê bı hev şa dîbin, kêfxweş dîbin û dî xewra duçin. Memê şiyar dibe, çi binihêre.. Zina çi halê çi... Radibe xwe girê dide û diçe diwana bavê xwe. Jî bavê xwe ra dibê :

— Bavo, ev işev çend şev e ez xewneki dîbinim. Ev xewna min ne ji xewnê xewna ye. Êdi ez pê emin im ku ev xewna min rast e, çunki eyni keçik çend şev li ser hev hat ser

textê min; em bı hev şa bûn, bı hev kêfxweş bûn. Navê keçikê Zin e û ji bajarê Cizira Botan e.

Bavê Memê dibê :

— Na lawo, xewnen te xewnen şeytani ne. Ew xewnen ku jîn tê da bin, şeytani ne. Tişteki wişa tuneye.

Go, de rabe em herin ba melle. Rabûn çû ba melle. Memê go : "Melle!" Melle go : "haaa.." Go: "ev işev çend şev e ez xewneki ewha dîbinim..." Go, melle kitêba xwe derxist û got :

— Na kurê min, ew xewnen ku te dine xewnen şeytani ne, derewin in.

Go, Memê gustilka tiliya xwe derxist û avê ser kitêba Melle. Go çaxa Melle li gustilkê nihêrt, go :

— Xewna te rast e kurê min, tişteki derew tê da tuneye.

Go, Memê got :

*Tew... xewna min rast e, beyan e  
Ne fasiq e ne şeytan e  
Divê xenimê Memê Alan dikeniyane*

Xewna min Zin e, kevoka nû farqin e  
Li serê birca aliyayê di jori ne  
Kesek tune ji min ra bine  
Tew... malik xirabê li min.

Go, Memê rabû çû ba bavê xwe û got :

Bavo bî xatirê te wo....  
Go, Memê lawo  
li darê dinê em û te ne, tê bî ku da heri  
Go, bavo ez ê herim çol û çolistan  
Beri û beristane  
Serê Memê ketiye xax û paxê di girane.

Go, bavê Memê got :

Memê lawo, min hewara Xwedê golê  
hebzbini  
Cihê hewar û gazi lê disekini  
Miradê ku tu li dû dici  
Tu car û tu car ji neqebili.

Go, bavê wi nîfir lê kîr. Memê bî dileki  
kesiri, ji diwana bavê xwe rabû çû, çû ba diya  
xwe û got :

Lê lê dayê bî xatirê ta wo...

Go, Memê lawo...  
Li darê dinê em û te ne tê bî ku da heri  
  
Go, dayê ez ê herim çol û çolistan  
Beri û beristane  
Havin çûye maye zivistane  
Serê Memê te ketiye xax û paxê di girane.

Go, lawo min hewara Xwedê golê hebzbini  
Cihê hewar û gazi lê disekini  
Mexsed û miradê tu li dû dici  
Tu car û tu car ji neqebili.

Go, diya wi ji nîfir lê kîr. Memê bî dileki  
şikesti rabû, çû ba xwişka xwe.

Go, xwişkê bî xatirê te wo...  
Go, Memê birawo...  
Li darê dinê em û te ne tê bî ku da heri  
Go, lê lê xwişkê qê birayê xelkê qet namurin

Hesêbi ez ji mirim.  
Lo lo birako gava birakê xelkê dimirin  
Min destê xwe gor û kefen dikirin  
Ji xwe ra rojê sê cara kêlikê wan weka heca  
serif tewaf dikirin  
birako lo, birako lo.

Xwişka Memê bî dilek kesiri birayê xwe verê  
kir, oxira xêrê lê kir.

Go, Memê berê xwe da Cizira Botan. Çol û  
çolistan, beri û beristan pir-hindik çû, gihişt  
deverekê ku ew bî xwe ji nîzanibû lî ku derê  
ye. Dî rî da rasti Xocê Xızır hat. Xocê Xızır ji  
Memê pirs kir, go "Memê tu bî ku da dici?"  
Go, Memê got : "Ez ê herim Cizira Botan."  
Go, Xocê Xızır got : "Memê neçe, ew cihê ku  
tu dici him dûr e him ji bî bela ye, tu bî xebe-  
ra min biki tu naçı..." Go, "welle ez ê herim".  
Go, "ka tu zani ku Cizira Botan lî ku re, tê çî  
awayi heri?" Go, "bî xwedê tu qewetek nikare  
min ji vê rîyê vegerine, çî bê serê min ji ez bî  
qedera xwe razi me." Go, "de çavê xwe bigre  
destê xwe ji bide min." Go, Memê çavê xwe  
girt destê xwe dayê, hew dit ku nêzi bajarê  
Cizirê lî ber cemeki ye. Go, pirekekê dî nava  
çem da ye û ciraxa dişo. Go, Memê çû tanga  
jinikê û pirs kir, got : "Xwişkê!.., gelo ev der  
kê der e." Go, "ma çavê te kor e, tu nîzani ev  
der kê der e?" Go, Memê serê xwe xwar kir û  
ber xwe ket, pişta xwe da jinikê û kete rî. Go,  
jinik bî xwe va hat, got : "Tehe.. çavê min  
birije, min dilê wi şikand. Belki zilamki xerib  
be, nîzanibe ev der kê der e." Go : "Birawo,  
stûyê min bışkê çavê min birije, bisekine ez ji  
te ra bêjim." Go : "Welle ev der bajarê Cizirê  
ye." Go : "Meriv diçê mala ki gelo?" Go  
jinikê bî kîlam got :

Go, lolo birako eger te jin revandibe here mala  
Qeretacdin  
Tu li qawe û çayê digeri here mala Mir Zeydin  
Tu li vir û fesadiyê digeri here mala Bekoyê  
bêdin.

Go, jinikê sê mala nişan dayê. Go, Memê dî  
dilê xwe da got : "Welle ez ê herim mala Qere-  
tacdin."  
Go, çû mala Qeretacdin. Sîlav da. Jê ra kursi

danin. Memê rûnişt, aveki sar vexwar. Go, Qeretacdin jê pirs kîr, got :

— Ya mîvan tu ji ku da têyi, bî ku da diçî?” Go : ”Helal hazır hatime vê derê.” Go, wê hingê qewraşa Zinê derbas bû çû kaniyê. Qewraşê di bin çava da nihêrt ku yek lî eywana mala Qeretacdin rûniştiye û xortê wisa qet tun-eye. Xwe ranegirt û demeki lê nihêrt û meyizand. Go, Memê ji di bin sîmbêla da lî keçikê nihêrt û di dilê xwe da got : ”Eceba ev e, ne ev e?...” Go, Qeretacdin derket û berê xwe da keçikê, got : ”biteqize here bê edeba bê edeb, tu lî wê derê çi diki, çi sekini?..” Go, qewraşa Zinê lî hev şaş bû, rakir cêrê vala û berê xwe da malê. Go, gava Zinê çav bî cêrê vala ket, berê xwe da qewraşê û got: ”Keçê stûyê te bışkê, tu ji sibê da lî ku derê yi, ka te cêrki av nani?..” Qewraş dîbê :

*Tew... tu naporsi li halê min  
Tu diporsi li cotê cêrê ava min  
Mêvanki hatiye mala Qeretacdin  
Çavêni wi çavêni ga ne  
Sîmbêlê wi sîmbêlê şêra ne  
Tiliyê wi tiliyê di teyrane  
Tu naporsi li halê min  
Tu diporsi li cotê cêrê ava min.*

Hii... Zinê dîbê, ”ewqas eşraf û mexlûqat hatine, qewraşa min tu car ewqas wesfê kesi nedaye. Ev hebe tunebe Memê ye.” Radibe qateki cil lî xwe dîke, cotek qondera devederzi dîke piyê xwe û dîbê : ”Serê te bixwe, ez ê iro herime avê.”

Lêdixe diçe avê. Gava di ber mala Qeretacdin ra derbas dibe, di bin cêran da lî Memê dînihêre û dîbişire. Memê ji di bin sîmbêla da lî Zinê dînihêre û dikene. Go, gava Qeretacdin rewşa Memê û Zinê dit, bî hêrs û awir vege riya ser Memê:

— Ya mîvan, mina ku tu meriveki çavlîder i, rabe ji mala min here!..

Go, Memê got :

— Ya bîra, welle ez meriveki çavlîder nin im, lê uştê ku hatiye serê min bîra neyê serê tesi. Rasti şûrê heqiyê ye, divê ez mesela xwe ji te ra bêjîm ya bîra.. Ez ji bo Zinê hatime... û bî vi awayi serpêhatiya xwe û Zinê, evinda-

riya xwe, xewna xwe yek bî yek ji Qeretacdin ra dîbêje. Piştre ji, gustilka Zinê derdixe û nişani Qeretacdin dide.

Go, Qeretacdin dîbê :

— Welle Zinê baltûza min e. Tu xorkeki mîr û camêr i, bî soz bext i. Edi ji bo min tu ne mîvan i, lî vi dinê û lî wi dinê tu birayê min ê eziz û bî qedir û qimet i.. dîbê û destê biratiyê didin hev.

De bîra Memê û Qeretacdin lî wê derê bîminin, em vege rin ser qewraşa Zinê. Piştî ku qewraş ji Zinê ra qala mîvanê Qeretacdin dîke û Zinê diçe kaniyê, qewraşê hanhanka berê xwe dîde mala bavê xwe û ji Bekoyê bavê xwe ra behsa vê meselê dîke...

Go, rojeki, qeretacdin ji Memê ra dîbê :

— Ya bîra em ê sibê herin ref û nêçirê. Gava em çûn, tu xwe ji ser hespê bavêje erdê û xwe lî nexweşinê deyne ku em te lî wê derê bîhêlin û Stî karibe te û Zinê bigihîne hev.

Qeretacdin radibe diçe diwana Mir û dîbê ”Mirê min, welle em zûva derneketune nêçirê.. Eger riza te pê hebe, em sibê herin.” Mir dîbê, ”baş e, haziriya xwe bikin em ê sibê herin.” Wê hingê Beko dîbêje, ”Mirê min, bêje bîra mîvanê te ji were...” Mir dîbê, ”Qeretacdin, bîra mîvanê te ji were!..”

Go, dotûra rojê tengê hespan dijdinin û bî rê dîkevin. Hê nagîhîjin bêdera, Memê dîbêje : ”Ay..ay... ez mirim.. ez mirim... ez merim...” û xwe ji ser hespê davêje. Beko dîbêje : ”Min dituye, kûçik goşte kûçika xwariye, destê min dermanê qolincê ye.” Her firkna li piştî Memê dîxe, kezeba wi dîqelêse. Qeretacdin lê dînihêre ku Beko bî ekis firka lê dîxe, dîbêje: ”Beko, ker kurê kerê.. Tu û hekimi çi tevi hev in. De rabe em herin!.. Mêvan, mîvanê min’ e. Mir mir, ma ma, işe te pê neketiye!”

Go, ew diçin nêçirê û Memê lî wê derê dîmine. Memê zêreki dîde zilameki û jê ra dîbêje : ”Ez vi zerê dîdim te. Tê heri dervayı bajêr û lî ser riya nêçirvanan bisekini. Gava serê siwaran xuya kîr, tê weri xeberê bîdi min.” Zilam diçe çaverêya siwaran dîke, Memê û Zinê ji diçin ba hev û dîkevin suhbeta evinê, ji xeman dûr bî hev şâ dîbin. Ew, lî wê derê di wi hali da ne, zilamê ku çaverêya siwaran dîke, ji dûri va

çav bî siwaran dîkeve û berê xwe dîde bajêr ku xeberê bide Memê. Lê hê dî rê da ye siwar tê û jê derbas dîbin. Zîlam dilezine, lê êdi bê feyde ye. Siwar beri zîlam dîgihijin ber mala Mir Zeydin.

Go, Memê dînihêre ku siwar hatin lî ber deri qelibin. Ew û Zinê li baxçe ne û êdi keysa xweveşartınê ji tune. Memê ji para Zinê dîke bin kurkê xwe û nîkare rabe. Qeretacdin tê ba Memê, dînihêre ku Mir Zeydin hat û Memê ji ber ranebû. Qeretacdin bî kîlam dîbêje :

*Mir Zeydin hate ji der da*

*Memê Alan kerem nekir rabe ji ber da*

*Dibê, ez fam dikim Mir Zeydin têye ji derda*

*Memê Alan ranebû ji ber da*

*Barê min bareki giran e*

*Nikarim rabim ji ber da..*

Şeşbaxiyê Zinê ji para nişan didê. Qeretacdin dibê, "wellahi iş giran e". Dîkeve mitalan ku çawa Mem û Zinê ji vi halê xîlas ke. Radibe hanhanka dîce malê û hespê xwe dikuje. Yek tê û dibê : "Mirê min, bî serê bavê te kim Heso û Çeko û Qeretacdin hespê hev kuştin!" Mir dibê : "Beko qondera min deyne!" Beko dibê : "Mirê min, bî serê bavê te kim iro hespê wan nebeziyane lewma hespê xwe kuştun. Hema ez bim tê dev jê berdi." Mir dibê, "de ku ew be ez dîkarim ji wan ra hespan bikirim."

Qeretacdin, Heso û Çeko qasek dîminin û dina xwe didin ku kes nehate hewara wan, radibin agir berdîdin xan û manên xwe û dîşewitinin. Yek baz dîde tê diwana Mir û dibê : "Mirê min, bî serê bavê te kim Hesen, Çeko û Qeretacdin xan û manên xwe tev şewitandin." Mir dibê : "Beko, kurê kerê qondera min deyne!" Beko dibê : "Mirê min, xan û manên wan kevin bûne, zanın ku tê sîbê xan û manên nû ji wan ra çeki lewma wîsa dîkin." Dibê : "De ku ew be, ew rehet e" û disa rûdînê. Hersê bira dînihêrin ku disa kes nehate hewara wan, Qeretacdin gazi. Stiyê dîke û dibê : "Stiyê, kurê xwe bide milê xwe û qurana reş bide ber dîlê xwe û berbî mala bavê xwe bîlezine! Ez bî wi xwedayı kim ku, ez bigihijime te ez ê serê te û

kurê te herdu ji bîfirinim! De lez ke bîlezine!" Stiyê radibe kurê xwe dîde milê xwe û berbî mala bavê xwe dilezine. Qeretacdin bî şûr beri ser dîde. Yek dibê : "Mirê min bî serê bavê te kim, Qeretacdin bî şûr beri ser Stiyê daye, ku bigihijê wê serê wê û kurê wê tev bîfirine." Dibê : "Beko, ker kurê kurê, qondera min deyne! İş giran bû te nehêst ku ez rabim!.." Mir radibe û berbî wan dîce. Stiyê xwe dîgihine birayê xwe û xwe davêje pişt wi (Mir). Dî wê navberê da Zinê ji wê derê direve. Gava ku ji famê hildikşe, qılçıkê kîrasê wê tê xuyan. Beko dibine û devê xwe dîke guhê Mir û jê ra dibê : "Bînihêre Mirê min, wa ji famê hîlkîşıya!.." Ewqasi ku qılçıkê kîrasê wê dibine. Kîrasê jîna wi û xwişka wi ji hev bûn. Mir dîkeve mitalan û dibê : "eceba ev jîna min bû yan xwişka min bû?.." û dîkeve şîbhê. Qeretacdin hanhanka xwe dîgihine Memê ş dibê : "De lez ke Memê, rabe em herin. Me ji bo te xwe xera kir, êdi wextê seknê nine." Vana radibin dîgihijin hev ku herin, Beko ji Mir Zeydin ra dibê : "Te dit, viya dexme ji li te xist û çû gihişte wan û wa çû!. Mir dibê : "Lê kâ ica em çawa bikin?" Dibê : "Çawa bikin", dibê, "ez anîha herim bigihijimê, ez karîm nehêlim herin". Dibê, "de ku tu karîbi nehêli here, here wi bine were!" Beko pey Memê dîkeve dibê "Memê!" dibê "ha", dibê "Mir gotiye, bîra neçe ez ê Zinê bîdimê". Memê ji pey wan dîqete. Qeretacdin dibê, "lawo, were me ji bo te xwe xera kir, me destê biratiyê bi şirani daye hevdu, em ji hev nabin. Ez ji te ra dibêjîm vegere, neçe!" Memê dibê, "na welle ez ê herim."

Memê dîde dû Beko û têna mala Mir Zeydin. Qasek rûdînê û bî hevra mijûl dîbin. Mir Zeydin dibê : "Memê, şîrteki min heye. Em ê bî setrencê bileyizin. Ki ji me ki bîve, ew ê navê dosta xwe ji hevra bêje." Setrencê tinin û dîkevin ber hev. Memê du cara ser hev Mir Zeydin dibê. Beko dîna xwe didê ku, halê Mir Zeydin ne tu hal e û eger bî vi awayi here ew ê Zinê ji ji dest here. Radibe dibê, "Mirê min, di setrencê da meriv carna cihê xwe biguhêre!. Tu bî ya min biki tê cihê xwe biguhêri.." Piştre hanhanka radibe û xwe dîgihine Zinê û jê ra dibê, "Zinê, mîzginiya min li te, birayê te, te

da Memê. Eger tu heri ber pacê tê Memê bibini..." Beko vedigere ba Mir Zeydin û Memê û wek ku tiştek nebûbe dikeve temasê. Pir derbas nabe, Beko dina xwe didê ku Memê zora Mir dibe, dibê " Errrrrik.. pencera me iro bala min kışand!.. Kevirê vê qesra me çi ren gin in!.." Memê serê xwe radike û li ali pence rê dînîhêre, çi bibine.. Zinê lî ber pencerê ketiye temaşa wi. Gava Memê çav bî Zinê dikeve, his û aqil ji seri dice. Ku hisê wi dice, Mir Zeydin sê cara ser hev Memê dibe û dibê, "Memê, ka navê dosta xwe bêje, qewlê me ew bû." Memê dibê, " welle navê dosta min Zin e." Mir Zeydin ji cih hildipeke, ji acizbûnê reng û rûcik lê namine. Dibê, "Beko, em çi bikin bi viya?" Beko dibê, "de em ê çi bikin.. Welle em ê wi bavêjin zîndiyânê."

Memê dîbin davê zîndiyânê. Zinê binê erdê lexem dike û xwe digihine balê. Sê çar lihêf û doşek jê ra datine ser hev, xwarinên xweş bi lezet jê ra dibe û demeki bî vi awayi derbas dibe. Beko rojeki ji Mir ra dibê, " Mirê min, bî serê bavê te kim eger sibê birayê Memê werin û dawe li te kin işê min pê tune.. Te vi merivi avête zîndiyânê û...." Mir hêrs dibe, "Ker kurê kerê, ne te got wi bavêje zîndiyânê. Ka here bînîhêre sax e ya mûri ye!.." Beko hanhanka dice dînîhêre ku, tew... tew... rewşa ku Memê tê da ye keski tê da nine. Hema vedigere tê ba Mir Zeydin û dibê, " Tew tew, bî serê bavê te kim Mirê min, kêfa ku Memê tê da ye tu ji ne tê da yi." Mir dibê, "lê em çawa bikin?.." Beko dibê, " ma em ê çi bikin, em ê wi bavêjin zîndiyaneke dîn."

Memê derdixin davêjin zîndiyaneke dîn. Heta Zinê cihê wi hin dibe, erdê lexem dike û xwe digihinê dice balê edi Memê bê mefer dibe, tu çara wi tune. Zinê dice serê dibê, "Memê!.. Memê!.." dibê "ha..." û dibê :

*Tewww... tu nati min bibini  
Tu hati herçi rihê ku heye tu bistini  
Çavki min çûye maye çavki  
Milki min çûye maye milki  
Şeqki min çûye maye şeqki  
Tu nati min bibini  
Tu hati herçi rihê ku heye tu bistini*

Zinê ji qudûm dibe, hêsturka dîbarine û dibê, "ka ez çawa bikim, heta min xwe gîhande te...." Memê dibê, " bishne pey birayê min." Birayê Memê çûne Beriya Heyalê. Zinê sofiki dîbine ku wi bishne Beriya Heyalê. Dibê, "sofi, here Beriya Heyalê ez ê vi zêrê hanê bîdime te. Tu heri ji Hesen, Çeko û Qeretacdin ra bêji, birayê dî halê mirinê da ye ha hûn digihijin serê ha nagihijin!.." Sofi dibê, "tê ramûsanki ji bîdi min?" Zinê dibê, "bî soz eger tu vegeri ez ê ramûsanki ji bîdim te." Sofi lê dice dice û xwe digihine hersê birayan. Mektûba Zinê dide destê wan û vedigere. Vana mektûbê dîxweynin û dibê " bî Xwedê evya bî ramûsana hatiye vê derê, de bigihijin vi sofiyê û jêkin." Lî wê derê şûrki davê serê sofi û nahêlin ku bigihije ba Zinê ji. Hersê bîra bî lez tê. Heta xwe digihinin Memê û wi ji zîndiyânê derdixin, Xwedê heqîya memê tine, dîmre.

Memê tinin ser mezel vedîşerîn. Zinê ji tê ser mezel û dua dike, dibê "ya Rabbi tu rihê min ji bistini!.." Zinê ji li ser mezelê Memê dikeve û dîmre. Mezelê Zinê ji li kîleka Memê vedidin û defîn dîkin. Pişti definkirinê herkes vedigere malê. Evarê li odê dî taziyê da Beko radibe dibê, "Ez ê niha ji we ra sond bixwîm ku, dî mezel da niha destê Memê û Zinê dî stuyê hev da ye!.." Qeretacdin hildipeke û herdu destê xwe dike qırıka Beko û dibê "Ker kurê kerê, em ê anîha herin mezel vekîn. Eger ne wîsa be ez ê serê te jêkin." Beko dibê, "herê vekîn, eger ne wîsa be serê min jêkin.." Vana çawa mezel vedikin û lê dînîhêrin, ku herê destê herduya dî bin serê hev da ye. Qeretacdin dibê" hema li vi dinê ji, li wi dinê ji" û şûrek davê serê Beko, serê wi difirine. Bî firandina serê Beko ra dilopek xwina reş dikeve nava herduya. Ew dilopa xwin dibe diriyek dî navbera herduyan da.

Anîha ji, ki salê careki diriya navbera herdû mezelan bîbirê, imanê pê dikire.

# Gıringiya Muzika Folklori


Eshed Muhammed Ali

"Yek ji dijwartırın karan ew e ku, em bızanıbin bî çı awayi danûstendin lî gel awazên folklori bikin. Û ez cesaret dıkım bêjîm ku, ev mijar dikare ji nivisandına kompozisyonekê pîr mezîn dijwartır be. (1) Dî sala 1931'i da Bartok ev tişt gotiye û weha ji şirovedike (2) : "Pîrsiyar ew e ku, muzika cotoyaran dikare bî çı rengi dî destê muzika huneri (art muzik) da tesira xwe nişan bide. Em dikarin muzika folklori bê guhartin û lî gel muzikek hevrê (accompaniment) pêşkêş bikin an ji bî zêde-kırına pêşmuzikek (Prelude) û dwiniyek (Postlude) tesira muzika cotoyaran nişan bûdîn."

Dî vi wari da em dikarin du rengên avakırına muzikê destnişan bikin. Dî rengê yekem da accompaniment, prelude û postlude lî hember awazê folklori roleki duyemin dileyizîn û

karê wan wek çemberek e ji bo awazên folklori. Anglo her wek ku tu kevireki gîranbiha dî çembereki lêhati da bî cih biki. Rengê duyem berajiyê rengê yekem e. Anglo awaza folklori wek parçeyek bîngehin e (motto) lê ew tiştên dor wi xwedi roleki gîring in. .... Pêwisti pîr pê heye, ew kîrasê ku em lî awaza folklori dîkîn lî xusûsiyeten awazê bî xwe bê û lî ser bîngeha wê awazê hatibe ava kîrin. (3)

Ev tiştên jorin dîde xuyan ku, muzika folklori ya cotoyaran çîqas tesira xwe lî ser qarekterê Bartok ê huneri heye û çîqas dijwariyên danûstendin lî gel elementenê vê muzikê nas dîkir. Bartok, gelek stran bî şêweya stranên folklori nîvisiyê ku merîv nîkare wana ji stranên folklori cuda bîke, yan ji cudakırına wan gelek zehmet e:



Em dîbinin ku ev awaz jî çar xetan pêk tê û pêplûka muziki ya wê pentatonic e (navê maqamek e). Ü pentatonic bî rengeki gîsti dî muzika folklori ya Macari da maqamek bîngehin e ji bo hemû stranên folklori.

Bartok dî wê baweriyê da ye ku "muzika cotyaran destpêka ideal e ji bo pêkanina ronesanseki muziki." (4) Dîvê lî vê derê em hunermendêن din ji ji bir nekin, wek Koday ê ku lî gel Bartok dî destpêka Sedsala 20'an da lêkolinêن muziki kîribû. Koday, zêtir bala xwe dabû ser awazên folklori yên Macari û ew ji dî wê baweriyê da bû ku, awazên folklori ji bo avakırına ronesanseki muziki bîngeh in. Bî awayê belavkirîna element û şêweyêن xwendîna stranên folklori bî rengeki heri fîreh dî nav gel da. Koday ji bo bî cihanina armanca xwe dî wê baweriyê da bû ku, dîviyabû meriv xwe lî ser perwerdegariya muzika konsantre bîke da ku wek mijareki bîngehin lî zarokxane û pengavên pêşin a dîbistanan bête pejîrandin.

Muzika folklori pîrreng e û aliyeki wê ya karekteristik heye ku, ji ali civatek tê ava kîrin û dî nava kategoriyeñ cuda yên gelêri da shin dîbe. Ji ber vê yekê ev muzika han mijar û

nâverokêñ gîsti yên jiyanê wek neynik derdixe pêşberi meriv. Ev muzik bî vi rengê lî ser hestêñ afîrandêr bandora xwe dîde xuyan û bî alikariya bî karanina elementêñ folklori, bo afîrandîna xebatêñ nû hêz û ilham dîde afîrandêr. Dî nav afîrandînen muziki da, beşek dibe ji hunera neteweyi. Her hunerek neteweyi ji, xwedi xusûsiyetêñ bîneçih in (mehelli) û ew xusûsiyetêñ wan en bîneçihî wana ji hevdu dîqetine. Miletêñ Slovaki û Iskandinavi dî warê pêkanina şêweyêñ muziki yên neteweyi da, lî pêşîya miletêñ din bûn. "Ji ber ku ew bî têkiliyêñ xwe yên stranên folklori, ên pêşiyê bûn" (5) Herweha ji, afîrandêren Rûs xurîsta muzika xwe ya folklori kîfş kîrin. "Ji awazên xwe yên folklori ra ji hunera polyphonik (pîrdeng) formêñ pîr esil afîrandîn da ku karibin bî rengeki ew formêñ afîrandi û xusûsiyetê awazên folklori bîparêzin û bîdin diyar kîrin." (6) Ew formêñ afîrandi ji aliki va wek neynîkeki pengaveki ji hunermendêñ Rûs tîne pêş çavê me, lî ali din ji xusûsiyetêñ muzika Rûsi kîfş dîke....

Lî ba hunermendêñ Rûs ev xebata han neqedîya û herweha lî ba hunermendêñ Sovyeti yên nûdem ji berdewam

kır, wek : Stravinski, Şustakoviç, Xaçatûyan, Emirov. Ev hunermen-dên han bı alikariya afîrandınêñ xwe naveroka hevdemi dan diyar kîrin. Armanca wan afîrandınêñ nediti yên ji hev cuda ew bû ku, têkiliya navbe-ra huner û folklorê xurt bikin. Rewşa afîrandêrên Macari, wek Koday, Bartok û Soni ji, her bı wi awayê bû. Jî bo awazêñ folklori şêweya strandin rengdêreki giştî ye û hîn caran ji, ritm dibe rengdêrê wan ên bingehin. Dî muzika folklori da stranêñ folklori beşa heri mezin e, ji ber pîraniya wan û hêsanbûna belavbûna wan bı navginêñ xuristi. Wek deng ê ku kevîntirin navgin e lî ba insan, ji bo ku pêşkêşkirina stranêñ xwe û wer-gerandîna hest, lavayı û daxwazêñ xwe dî hemû cûre seremoniyân da bîdin xuyan. Tevi ku dî nav muzika heremêñ cihanê da cudayıyêñ mate-ryali û xuristi (ruhi) hene ji, em dîkarin bı giştî strana folklori xwedi şêweyek strani yan ji ritmik e û bı her weha dî warê têkiliyêñ huneri û afîrandınêñ muziki da bûye xwedi hêjajîyeke bingehin.

Miletêñ cihanê wek İtali, Elmani, Slovaki, Finlandi, Macari, Iskandina-vi û yên dîn ji bo xuliqandîna afîrandınêñ muziki yên nû, ci dî warê stran da, ci dî opera da û ci ji dî afîrandınêñ orkestrayı û instrumental da hunerê polyphoni û harmoni hîlbijartîn.

Ev hîlbijartîn, ji bo afîrandîna berhemêñ muziki yên xwedi şêweyêñ huneri û ji hev cuda, ku cihan ji ser-dema klasik heta serdema hevdem a iroyin bûne şahidê wan, xwedi bando-reki dî cih da bû. Jî bo afîrandîna berhemêñ gîranbiha, rengê hîlbijar-tînê xwedi roleki bingehin bû da ku

afîrandêr karîbin hemû qonaxêñ huneri û ruhi yên lêhati bo awazêñ folklori peyda bikin. Lî gel berhemêñ muziki yên folklori şertêñ bingehin ên têkiliyêñ bı prensib ew e :

Gava dî berhemêñ nû da awazeki folklori bête bı karanin, karekterê awaz bête parastin û berhemêñ nû hemû xusûsiyetêñ wê awazê nişan bîde. Dîvê hunermend, ji bo diyarkirina qonaxêñ wi berhemî rîyêñ heri bî kîr (efektiv) kîfş kîrîbe da ku pêş-kêşî xelkê bîke û vi pêşkêşiyê bî metodêñ ku bı rengeki yekser (di-rekt) an ji gav bı gav lî ser sewiya wan a kulturi û zewqa wan bandor çê dîke, bı cih bine. Bı vi rengi guhdar, lî gor qudra ta xwe gav bı gav ber-hemêñ muziki nas dîke û hestêñ wi fîri miljarêñ folklori yên nêzi ruhê wi dîbe. Armanca domandin û pêş-vebirina vê xebatê ew e ku, kultureki muziki ya neteweyi ya xwedi şertêñ objektiv û ruhi bête afîrandin. Ev ji, armanca Koday û Bartok bû. Dema ku dî-sala 1906'an da lî ser strana folklori ya macari dest bı lêkolinêñ xwe kîrin, yekem car xebatêñ xwe wek berhemeki tekûz weşandin. Mebest ji wan stranêñ ku lî gel piyano dîhatin xwendin ew bû ku, "ji bo afîrandîna xwe yên nû zîmaneki peyda bikin û herweha ew berhem bı xwe pêwisi-yek bı guhdareki têgîhişti û ente-lektuel anin meydanê." (7) Jî ber ku dî nav kategoriyeñ gel da belavbûna kultura muziki pêwist bû, ku bîkarîbe ji guhdarêñ têgîhişti tipeki cîvaki bîafirine. Sloganê wan ji ew bû : "Muzik mîlkê herkesi." (8) Koday dîbêje ku, "ji bo afîrandîna muzikek kulturi ya neteweyi sê şert pêwist in :

1- Kevneşopi (tradision).

2- Qabiliyetek şexsi (individuel talent).

3- Têkiliyên ruhi yên navbera cîvatê û hunermendêni wi, ku cîvat wan hunermendan wek mîlkê xwe qebûl dîkin. (9)

Koday lî ser kevneşopi weha dîbêje : "..... bê kevneşopi (tradision) Zeviyek bî ber tune ye, lî ali din çıqas ew kevneşopi jîndar be ji, bî serê xwe nîkarin formêni nû yên hûnerê bîafirin. Lî vîr hunermend û cîvat dî afîrandin û pêşveçûne muziki da rolêni bîngehin dileyizin. Kevneşopi di xebata berhemên hunermend da elementên pêwist amade dike, cîvat ji kaniya qonaxêni ruhi yên berhemên hunermend e. Qabiliyeten şexsi lî ser afîrandina kultureki muziki ya nete-WEyi bî awayeki yekser xwedi bandoreki materyali ye. Armanca Bartok û Koday ew bû ku, şêweyekî afîrandinê yê ji şêweyêni serdema xwe yên populer cuda, wek ê Elmani, bîafirine da ku bikaribe karekter Macari bide xuyan. Bartok afîrandereki wîsa bû ku, karibû dengê berhemên xwe bigihine dervayi welat. Koday ji, di warê bî karanina elementên awazi û navginêni folklori da, yên ku karibin karekter awazêni Macari diyar bikin, jir bû. Xebatêni herdu hunermendêni hêja hevdu temam dikirin û bî hevra karibûn naveroka hevdemi û kevneşopi wek neynîkek nişan bîdin. Xebatêni wan bûn nişanekî gelemeperi ji bo hemû hûnerên muziki.

#### Têbini :

- (1) Bartok Bela : "Complete edition", rûp: 7
- (2) Awaz û stranêni cotkaran, muzika folklori ya Macariyan bî xwe ye

- (şirovekîriña nîviskar bî xwe)
- (3) Bartok Bela : "Complete edition", rûp: 7
  - (4) Sidney Finkelstein, "How music expresses ideas", rûp: 95
  - (5) The Selected Writings of Zoltan Kodaly, rûp: 84
  - (6) Eyni berhem.
  - (7) Erzsebet Szonyi, "Kodaly Principles in Practice", rûp: 69
  - (8) Eyni berhem.
  - (9) "Selected Writings of Kodaly", rûp: 30.
  - (10) Eyni berhem.

#### Çavkani :

- Theory and method in ethnomusicology, by Bruno Nettle - London.
- Serbo-Croatian folk Songs, by Bartok Bela - Colombia University Press.
- Melody types of Egyptian wedding songs, by Ilona Borsai and Margit Toth, Akademiai Kiado - Budapest, 1970.
- The Selected writings of Zoltan Kodaly, Corvina Press - Budapest.
- Studia memoriae Belae Bartok Sacra, Editio Tertia Publishing House of Hungarian Academy of Sciences - Budapest, 1959.
- Bartok Bela, Complete edition - Piano music - Hungaraton.
- How music expresses ideas, by Sidney Finkelstein - London Lawrence and Wishart, 1952.
- Kodaly Principles in Practice, by Erzsebet Szonyi, Corvina Press - Budapest.

**Werger : Xoşnav û A. Gernas**

# Bi prof. Şekroyê Xudo ra




FOTO: ROJA NÜ

*Serokê Beşa Kurdzaniyê li Enstituya Rohilatzaniyê ya Ermenistanê û serokê Navenda Lêkolinên Kurdi, dirokzanê kurd Prof. Şekroyê Xudo, di dawiya meha Nisanê da li Stockholmê bû. Roja Nû pêra heppevinek çêkir û derheqa çend pirsên cuda da ditinêni wi wergirt. Em heppevinê li vir pêşkêsi xwendevanan dikin.*

*ROJA NÛ: Mamosta, ji kerema xwe ra tu bi kurti behsa rewşa kurdên Rûsyayê biki. Halê kurdan ci ye li wir?*

**Ş. XUDO:** Weki em zehf dîrê nebêjin, kurt û eşkere rewşa kurdên Rûsyayê nebaş e. Ne baş e, ji ber ku iro li ser axa Yekitiya Sovyeta berê gelek dewletên teze hatine çêkirin ku di

bînega wan da nasyonalizm heye. Carcaran ew nasyonalizm ji digihije şovenizmê. nuha nasyonalizm bûye wek aleke bînega, bûye adet, ki tê ser hukumatê, gerek pêşiyê mîletperestiya xwe nişande, ku bikaribe karê xwe pêşda bîbe. Yani weke nexweşiyekê ye. Dîbe ku wextekê ji çapê zehftur ew qedexe bû, nuha ji ji çapê zêdetir destûra wê danê, hatiye

meydanê. Îcar bî vê yekêra girêdayi, ew mîletên ku dewletên wan yên netewi hatine çêkîrin lî ser axa nuha, siyaseta xwe pêktinîn. Û berê ya ku lî Moskovayê, pak yan xirab mafîn mîletên biçûk dîparast nuha jî ortê hatiye hildan. Lewma ji, halê kurda iro em dîkarin bêjîn ku bî temami pey hilşandina Yekitiya Sovyetê ra xirab bûye.

Û bî vê yekê ra girêdayi, ez dixwazîm dîna we bidim ser tişteki; bî klasifikasiya mîn sê grûbîn mîletên biçûk (minorîtê) hene. Yek ew in ku lî komarêن xwe najin, lê dewleta wan ya mîletiyê heye. Mesela ûris lî Tacikistanê, Qazaxistanê, Baltikayê dijin, wek mîletê biçûk, ne wek mayoritê. Lî dewleta ûrisa bî xwe heye. Ermeni ji wîsa nin. Azeri ji, Teter ji... Eva grûbek. Weki wîsa ne grûbeke mîletên biçûk yên ku komarêن wan hene, lê ewana ji komarêن xwe der dijin. Grûba duda ew e, ku ev mîletên biçûk lî komarêن cud-cuda, yan lî ûrîsetê, yan ji lî komarêن Sovyetê yên berê da dijin, ku nuha bûne dewletên netewi. Lî dewletên wan yên mak, çawa ku dîbêjîn yên sereke hene, ji hidûdê Yekitiya Sovyeta berê der. Lî dereke dîn. Mesela alman lî ûrîsetê dijin, lî dewleta alman heye. Macar in, bûlgar in, poloni ne, koreyi ne, çin in û yên mayin nin. Weki wîsa ye eva ji grûba duda. Grûba sisêya ew grûb e ku dî seri da kurd daxîl in. Kurd ji vê grûbê ne. Ev dî halê heri çetin da nin. Çimki ew mîletên biçûk in, weke mîletên mayin. Lî piştgiriya wan tune, ne lî ser axa Sovyetê ya berê, ne ji ji hidûdê wê der.

Yani hilşandina Sovyetê bona mîletên biçûk, hersê grûban ji xirab bû. Hersê grûb yên ku ne lî ser axa xwe ne, yên ku welatê wan tune, bona hersêkan ji xirab bû. Lî bona kurda em dîkarin hesab bikin ku malxîrabi bû. Bî vê yekê ra ji girêdayi, ew kurdê ku ji ciyê xwe derketine; kurdêñ musulman ji Ermenistanê, paşê parçek ji êzdiya û kurdêñ Gurcistanê û yên mayin lî ciyêñ nû belav bûne. Dîha zehf hatine ûrîsetê. Statuya wan ne eyan e. Dibistanê wan ji ji ortê hatine hildanê, jiyanêke wan ya çandi tune. Bî cîvaki halê wan gîran e, çimki ji sistema Sovyeta berê va tê, gereke ew bî nîvisar izna wan hebe lî filan derê

bijin. Eva çetinayêñ mezîn pêşda tîne. Alika-riya zara nastinîn, carcara miaşê xwe nastinîn. Bî kurti gelek çetinayêñ mezîn pêşda hatine. Û lewma ji, carekê hevaleki ji mîn pîrs kir, got hilşandina Sovyetê çawa bû, bî temami ji bona kurdan? Mîn got, dîbe diwanêñ Sovyetê yên berê, piştgiriya têkoşina kurda çawa lazîm bû nedikir. Hilşandina wê bona kurdêñ dereke baş bû, lê bona kurdêñ Sovyetê nebaş bû. Nuha halê wan xirab û çetin e.

*ROJA NÜ: We got jiyanâ çandi ya kurdêñ Sovyeta berê tune, dibistanêñ kurdan tune ne. Gelo ew akademiyêñ ku xebatêñ kurdzaniyê dikirin, nuha disa hene, yan xebata wan ji sekuniye?*

**Ş. XUDO:** Ew disa hene. Beşê kurdzaniyê lî Enstituta Ermenistanê ya Rohîlatzaniyê disa dîmine. Ez nuha hatîme Moskovayê, se-rokê Navenda Lêkolinêñ Kurdi me, lê heta vê gavê ji wêderê nehatîme azadkîrin. Ew ji hela hêdi bin serweriya mîn da ye. Lî Moskovayê ji beşê kurdzaniyê heye, lî Leningradê ji grûbeke biçûk heye. Lî weke berê, bî çapa berê xebat nayêñ kîrin. Çimki nuha ew sistêma berê bî temami guhuriye, rewşa ilmê geleki girantur bûye. Ev bî finansê ra girêdayi ye, bî pîrsa komunikasyonê (çûn-hatîn) ra girêdayi ye. Dema yek bîxwaze ji bona xebateki here dereke dîn, dîkeve bin mesrefeke gîran. Transport gelekibihaye, mîvanxane geleki bîha bûne. Ev gişk tesirê lî ser wê yekê dikin ku xebat lî ber sekînandinê ne. Eva yek. Ya duda pîrsa çapkirina pîrtûkan û domkîrina xebatêñ ilmi ye, ku dî haleki geleki çetin da ne. Mesela çend xebatêñ me bî xwe hene, dî nav wan da wîsa ji yên kurdzaniyê hene, lî Yêrêvanê sekunîne. Kes nîkare çap bîke, çimki kaxez bîha ye, karebe (cereyan) tune, pere tune. Kîriz e. Kîrizeke mezîn heye. Û bî vêyekêra girêdayi, ez bersîva vê pîrsê bî kurti dîkarim bîdim, ku xebatêñ kurdzaniyê nehatîne sekînandin helbet, lê astengiyêñ mezîn lî ser riya wê çêbûne.

*ROJA NÜ: Yani mirov dikare bibêje ku ji ber van şertan we sazkırına Navenda Lêkolinêñ Kurdi hewce dit?*

**Ş. XUDO:** Erê pîrsa te rast e. Menayeke amadekirin çêkirina NLK ji ev bû, ku grûbê berê, weke berê nikaribûn kar bikirana. Eva yek. Ya duda ew bû ku me pîrs daniye pêşîya xwe û angori xwastinêd roja iroyin, yên ku xasma bi têkoşîna kurdan ra girêdayi ne, wan daynin ser dereceke diha bîlind.

*ROJA NÛ Em dizanın ku dî nav bernama we da, amadekirin û derxistina pirtûkên dersê ji hene. Ev xebateke hêja û piroz e, we daniye ber xwe. Gelo derheqa pîrsên gramerê, rastnivisandina ziman û zaravêñ kurdi da we prensib tesbit kirine? Evana pîrsgirêkên mezin in li ber we û kadroyêñ ku vi kari bikin...*

**Ş. XUDO:** Bi vê pîrsa te ra girêdayi, ez dixwazim ku em dina xwe bîdin ser du faktoren ku rola wan geleki gîring e. Yek ew e, ku iro pîrsa hinkirina şagirtêñ kurdan, zarokêñ kurdan li her dera pîrseke gîring e. Ez bawer dikim ku zûtirekê, di wexteke ne dûr da, li Kurdistan Bakûr, Kurdistan Tîrkiyê da, şanseki bi zîmanê dê, bi zîmanê xwe hinbûna kurdan wê bê ortê. Bona vê dî destê me da tişteki hazır tune vê gavê. Weki wisan e, hineki ji em difikirin bona roja sîbetirê, da ku em nişkêva li ber problemê nesekinîn. Hîm mamostê me, hîm ji şagirtêñ me, gereke tiştek dî destâ da hebe ku zîmanê xwe fer bîbe. Çimki ew dijminê ku heta nuha devê mîletê kurd girtibû, paşê diqewime weha bi qerf û qar li me binihêre, weki em nikarin wê prosesê bîdine amadekirin.

Îro cem me, pêşekzanêñ me dî wê derecê da hene, lingvist û zîmanzan hene û me qîrar kiriye dî nava xebatêñ NLK da ciki ji bîdine çêkirin amadekirina pirtûkêñ bona dersa. Ez vêcarê wexta hatum Stockholmê, min bi xwe ra yek aniye. Gramera kurdi bona dersxanêñ 4-9. Ev pêşhaziriye e, taslaxek e. Bavê Nazê li ser xebitiye û me aniye vêderê. Ev pirtûk dî destê hevalan da ye, yên ku bi van pîrsan va mijûl dîbin. Û me jî wan hêvi kir ku ew ji lê binihêrin. Çimki em dî praktika xwe da dixwazin qaideki weha bîdin rûniştandin: ew xebatêñ em dînivisin gereke hema dî carekê da neyên çapkirin. Beri wê divê ber çava ra derbas

be, bê rexnekirin, enenekirin. Wîsa wê baştı bîbe.

*ROJA NÛ Dî van çend salêñ dawin da, tu çend caran hati Awrûpayê û te ji nêzik va rewşa kurdêñ muhacir ditiye û pê dizani. Derheqa jiyana wan da, xebat û çalakiyêñ wan da intiba te çi ye? Li gor raya te çi kîmasi hene, ditin û pêşniyazêñ te çi ne?*

**Ş. XUDO:** Ez dixwazim bersîva vê pîrsê ji wê yekê va dest pê bikim, weki, para heri mezin ya mihacîriyê zordestiya siyasi ye. Sodemeki mihacîriyê ji halê abori ye, lê çiqas siyasi ye ne hewqasi abori ye. Çimki ji berê da, halê abori çiqas gîran bûye ji kurd ji welatê xwe derneketine. Ev tişteki geleki interesant e ku ev bûye şerteki xwe xwedikirina mîletê me ji. Îcar iro em dikarnî êdi xeberdin derheqa hebûna diaspora kurdan ya geleki belavbûyi û geleki bi kaşa xwe va gîran.

Tişte şabûnê ew e ku, diaspora kurdan, koloniya kurdan li Swêdê, koloniya kurdan li Almanyayê, koloniya kurdan li Fransayê, li Amerikayê û li ciyêñ mayin, jîyanekî wan ya cîvaki û çandî hatîye çêkirin, mekanîzm hatîne çêkirin û kar dîkin. Yani ew wîsa xwe bi serê xwe najin. Mesela li Swêdê Federasyon dixebite, li Almanyayê KOMIKAR dixebite û yên mayin... Enstituya Parisê dixebite. Evana tiştine geleki baş in. Xebatêñ ku wan kîrine û dîkin, bi ditîna min rola wana geleki gîring e, dî prosesa danasına pîrsgirêka kurdan da, li Awrûpayê û Amerikayê.

Îro eger li ser mesela kurdi êdi xeberdaneke mezin tê kîrin, parlamento û hukumat dî nav pêwendiyêñ xwe da ciki êpêce didine mesela kurdan, ez sedi sed bawer dikim ku kes nikare vêya inkar bike, ku rola diaspora geleki mezin e. Lî xwastina min ev e, ku em li ser vê hêsa nebîn, qîma xwe bi vê neynîn. Gereke em rê û mecalêñ diha efektif, diha baş bîbinin ku diha bi aktifi guhdariya temamiya cihanê bîdine ser qewimandinê Kurdistanê.

Em bêne ser kîmasiyan, kîmasi kijan in? Yekiti, hêz û imkan êpêce hene û ev prosesa heyi mirova şâ dîke. Lî bi vê ra tevayı, ew parçebûn ku her yek ali xwe da kişandin hela

hê ji ortê ranebûye. Eva, bî ditina mîn geleki ziyanê dide. Carcaran em lî pişt hev xeber dîdîn, dewsa ku eşkere bêjin û tev bibin û tişteki bîdîne rastkîrin. Carcaran ev ji dî nav praktika me da heye; em tişteñ xîrab rexne dikin, lê carcaran tişteñ baş ji rexne dikin. Yani em bî çavê reş lî her tişti dînihîrin. Tişteñ pak naxwazin bibinîn. Ev ji nebaş e. Wexta tişteki pak tê kîrin, gereke mîrov qime-tê wi pak bîde, ku situmulans (teşwiq) çêbîbe, hê tişteki baş bê kîrinê.

Çetinayı, problemen ku lî ber diaspora me hene, wîsa ji lî ber koloniya Swêdê sekînîne. Kijan in? Eva pîrseke dîrêj e, mîrov ser vê geleki dîkare bîaxîfe. Lî ez tenê du pîrsan binim pêş. Mesela bî texmina mîn, gereke em ser wê yekê bîfikîrin, ku mecalê pêşketinê, xwendinê, bona terbiyekîrinâ zarokan hazirkîrina kadroyen cure-cure li Kurdistanê tû-nebûne. Lî vir heye. Ne rast e? Meydan vekiri ye. İcar kurdino bî kerema xwe werin, dî nav 5, 10, 15 salan da isbat bikin ku dema mecal ji we ra çêbû, hûn mîleteki zirek in û dîkarin kadroyen hêja hazır bikin. Ev, bîra dî warê sportê da be, bîra dî warê kîşik da be, warê ilim da be û hwd.

İcar ev prosesa bî otomotiki nayê kîrin. Gereke geleki arikariya wê bikin. Tişteki eşkere ye ku mîrov carekê ra maleke xweşik û xaniki her mecali va bê ciwarkîrin, cilê baş lî xwe bike, mentaliteta wi yan ji kultura wi nayê gu-hastin. Hela dî nav me da tradisyonen kevn ji hene, dî jiyana duh da dîjin. Ev deyneki mezîn dike ser federasyonê, KOMKAR'ê, rewşenbirên me, rîxistinê me, ku em merifetên wan dî ali matamitikê da ye, şîkîlkîşandîn, sinemavantîyê da ye, sportê da ye, êdi çi dîbe, wana bibinîn û arikariya wan bikin. Mesela bî ditina mîn, wê tişteki geleki baş be, eger lî rex federasyonê, yan ji KOMKAR'ê komisyonek hebe, hema tenê bî pîrsa zarokên bî merifet ra mijûl bîbe. Ermeniya, yahûdiya wîsa kîriye. Wana fond ji çêdikîrin. Mesela fond bona wan şagirtan yênu ku dî pêşerojê da bibin pêşekzanen mezîn. Înşella, pîsti çend sala, temamiya kurdên Swêdê, dîkarin bêna naskîrin

bî serê pêşekzanekî geleki navdar. Ev dîkare matematikzanek be, dîkare wênekêsek be, yan tişteki wek van.. Hêvidar im dî vi wari da xebatêna baş bêna kîrin.

Tişteki ji bêjîm, diaspora kurdî gereke bona tevaya cîvaka kurdi, bona kurd û Kurdistanê bîbe wek mektebeki. Em ji Rohilatê dûr ketîne. Em bîdestê bîdestan nîn. Ew cîmaetên ku em dî bin destê wan da nîn, ew ji aliyê kultur, tradisyonen xwe va ne hewqasi pêşketi ne. Demokratizm ji wan ji dûr e. İcar madem em ketîne vêderê, dîvî em bibin wek dîbistanekî.

Em iro bona Kurdistanê serbixwe, mîleteki serdest şerkariyê dikin. Herkes, yek bî qelema xwe, yek bî tîfîngâ xwe va, bî awayen cuda dixebeitin. Diaspora me gereke bîbe wek lûleki, bîbe weke kanalekê, ku em tradisyonen Awrûpayê û Amerikayê yê demokratizmê ji bibin wêderê. Mesela ji nuha va gereke em xwe hazırî wê fîkrê bikin, ku dî Kurdistanê da gereke tenê partiyek nebe, hukumatê bî tenê negre destê xwe û hayda! Divê demokratiya rasti hebe. Gereke parti hebin, gereke reqabeta partîyan hebe. Pîsti sê-çar salan bî hilbijartın yek bikaribe şûna yê dîn bigre. Bî vi awayi em ê bikaribin wê paşdamayina heyi ji ortê hîlinin.

*ROJA NÜ: Pîrseke dawin ji em ê li ser rewşa Kurdistanê û tevgera azadiyê bibûrsin. Wek dirokzan hûn rewşa iro çawa dibinîn? (\*)*

**S. XUDO:** Bî raya mîn, ne mîroveki pîspor, yekî ne pîspor ji nikare nebîne ku iro problema kurdan ketîye rewşike nû. Hîm ji aliyê hundîr, hîm ji aliyê der va. Ya der û pozitiv ew e ku, bere bere pîrsa kurdan ji hevriki û konfrontasya rohilat û roavayê derdikeve.

Dî navbera şerq û xerbê da şer bû, em ji dî bin dest û piyê wan da dîcûn. Me xwe diavête pêşa yekî yê dîn digot ez ê li nav çavê texim, me xwe diavête pêşa kijani çênedibû. Û iro eger tişteki pozitif heye ew ji bî têkiliyên Amerika û Rûsyayê, şerq û xerb bî temami, li ciyekî pîr, li ciyekî hindîk, nêziki fikrekê dibin li ser pîrsa kurdan. Eva yek. Ya duda ew

e ku, êdi herkesi dit û fehm kır ku pîrsa kurda bî çek, bî destê zorê nayê helkirin. Bî vê yekê ra girêdayi, şanseki diroki ketiye destê me. Ew ji Kurdistana Başûr e, ku iro parlament û hukumata wê hatiye sazkirin. Ü pirs peşda tê kişandin ku mafêñ kurdan li Iraqê bê naskirin, lî ser prênsipa federalizmê. Me dest ji otonomiyê bî rîza dili nekişand. Jiyanê xwe bî xwe nişanda, Baasiya bî xwe nişanda ku modela otonomiyê naxebîte. Ez helbet têkili karê rêxistinêni siyasi nabim, naxwazim bîbim şiretkar, lê bî ditina min, kijan parçê Kurdistanê dixwazi hilde, modela otonomiyê naxebîte. Modela otonomiyê li Awrûpayê dikare bixebeit, lê li Rohilata Navin nikare bixebeit. Dî bin tesira prensibên islami da hidûdên mîletan nayê naskirin. Ev yek, ya duda ji otonomi dî eslê xwe da parçeki demokratiya rasti ye. Lî vêderê demokrati tune. Nikare otonomi hebe. Federasyon cuda ye. Lî gor federasyonê, ez ji, tu ji dewlet in. Ez naxwazim cihê bim, tu naxwazi cihê bi, hingê em dî hidûdê dewletekê da dijin. Ev perspektiv ya federalizmê ye.

İro çawa em dîbinin, dî helkirin, pêşdabîrin, safikirina pîrsa kurda da, riya siyasi-diplomasi rola geleki mezîn dilize. Ü ez texmin dikim, ev tendens, ev meyîl wê her biçe meydanekî firetir li ber xwe veke. Çimki bî riya çekdari ne sedi sed kurd bî serketin, ne ji hukumat bî serket. Encam fiti-fiti bû. Weki wîsa ne nayê safikirin. Ev yek, ya duda dewleten mezîn, bawer biki % 90 hatine ser wê fikrê, ku gereke ew ocaxen konfiliktan gîşk bêñ vemirandin û wan probleman bî riya siyasi safi bikin. Ne bî riya çekdari. Ev li seranseri dînyayê derbas dibe. Ev çûye gîhiştîye Afrika Başûr ji. Bî vê yekê ra girêdayi, perspektiva safikirina mesela kurda geleki bî riya siyasi-diplomasi va girêdayi ye. Lewma ji dijiminê tevgera kurda, nuha ji şerê çekdari zehftur, ducartur gudariya xwe didine ser metodên diplomasi-siyasi. Diha rast, ji bin va, dî nav da li parçekirin û tevlihevkirina tevgeren kurda digerin. Ez texmina dikim, dijayetiya rêxistinêni kurda a başûr û bakûr bî vê yekê ra girêdayi ye. Tîliya dijiminan di vêderê da geleki gîring e. Bî her te-

heri dixwazin, vêya li hev xin. Çimki eşkere ye li Kurdistana Başûr şanseki gelek mezîn heye ku himê xwe-xwetiya kurda bê daninê. Weki wîsa ye ev ocaxeke lape sereke ye û iro deynê her kurdi ye ku piştgiriya Kurdistana Iraqê bike. Eva dikare bibe weke çapeke patriotizmê ji. Ki Kurdistana Başûr iro neparêze, bî ditna min ew ne patriot e, ne mîletparêz e.

Lî aliyê din, em çiqas xeber dîdin ji li ser kîmaniyêni li Kurdistana Tîrkiyê û Partiya Karkerê Kurdistan (PKK) ku bî neheqi tê navkirin terorist, lê terorist dewleta Tîrkiyê ye. Ü eger cûre û metodên şerkariya PKK ji hene, weki têne rexnekirin ji, dî vê yekê da PKK ne hewqas gunekar e çiqa Tîrkiye gunekar e. Ev cûre Tîrkiyê xwe bî xwe aniye meydanê.

Lî Tîrkiyê pîrsgrêka kurda çiqas dice gîringtir dibe. Tîrkiye serederi, çareseriye ji wana nake. Çawa bikin evan herdu ocazan beri hev din...! İcar tişteki eşkere ye, ku spesifika her parçeyeki Kurdistanê heye. Eva xeberdaneke dirêj e, careke din dî hevpeyvineke din da em dikarin derbas bikin. Ev spesifika ji ew e, weki ci ji kurdêñ parçeki ra dest dide, ji yê din ra nade. Lî vira pîrsen taktika û stratejiyê hene. Lê gereke serokên rêxistinêni me wana li hemberi hev ranekin, neynin pêşberi hev. İro kijan pîrs arikariya herali dixwaze gereke gîşk piştgiriya wê bikin bona pêşdaçûna prosesê li parçen Kurdistanê yên mayin da.

Bî temami, dî dawiya vê pîrsê da dikarim bêjim ku, wek miroveki kurd, wek ulmdareki kurd dî temamiya jiyana xwe da optimist bûme. Lê iro ez dikarim dî miqaleki da yan ji dî hevpeyvinekê da hûrgili argûmentan binim ku pîrsa kurda, pîrsgrêka kurda, dî wadeki ne dirêj da wê bê helkirin, weke şerteki ne tenê ji bo razikirina şerê kurda yê heq û dirêj û xwinrij, lê wîsa ji weke şerteki rehetiya Rohilata Nêzik û Orte. Bêyi safikirina pîrsa kurda li wêderê reheti û aşıti nayê çêkirin.

(\*) Dema ev hevpeyvin hat çêkirin, büyerên dawi yên li Kurdistana Başûr hina dest pênekirübûn.

# ASİMİLASYON, ZIMANGUHASTIN-ZIMANPARASTIN Û REWSA ZIMANÊ KURDİ-1

(B1 awireki kurt)

Haluk Öztürk

İro lı seranseri dînyayê ji 3000-i zêdetir zîman têن qisekirin. Piraniya wan ne tenê zîmanê xeberdanê ne, herwîsa zîmanê xwendin û nîvisandinê ne ji. Wek tê zanin hîn zîman ji hene ku êdi tukes pê qise nake. Mesela zîmanê hititi, avestayı, latini, goti, oskiki û hwd. mirov dikare wek nîmûne bide. Ji van ra dîbêjin zîmanê mîri. Dî nav zîmanê zêndi da, hînek zîman hene ku, dî binê zordestiyê da nin. Ew lı hember xetera asimilasyonê cehd dîkîn ku hebûna xwe bîdominin.

Lı çarali dînyayê komên gelan bî çand û zîmanê xwe yên cuda lı rex hev dijin. Hînek ji wan dî nav sinorê dewleteke xweser da ci dîgrin. Lê piri caran, dî nav sinorê yek dewletekê da, ji yekê bêtir grûbêñ-zîmani (xelk, milet) bî hevra dijin. Çawa ku dî nav sinorê dewletekê da gelek grûbêñ zîmani dikarin hebin, wîsa ji grûbeke zîmani dikare dî nav çend dewletan da bê parçekirin. Mesela wek gelê Kurd (Tîrkiye, İran, Iraq, Suriye) û gelê Bask (İspanya, Fransa).

Sedemên diroki yên vê rewşê gelek in. Lê dî seri da siyaseta emperyalist tê. Mesela kolonyalisten ingiliz, bî kolonikirna Hindistanê ra,

gelek cîvatêñ xwedi zîmanê cuda-cuda dî nav sinoreki gihadîn hev û zîmanê ingilizi wek zîmanê idari lı ser wan ferzkirin. Emperyalistin lı gelek derêñ dîn yên Asya û Afrikayê ji, dî kişandîna sinoran da lı gor kîfa xwe, lı gor menfaetêñ xwe hereket kirine. Wan, xelkêñ bineci parce kirine, yan ji gelek xelkêñ cuda dî bin idara dewletekê da cîvandîne, û qet guh nedane berjewendiyêñ gelan.

Parçekirina Kurdistanê û gelê kurd ji bî vi awayi bûye. Pişti Şerê Cihanê yê Yekemin, bî sinorêñ neheq û sünî xarita siyasi ya Rohîlata Navin hatiye danin. Gelê kurd û welatê wi dî nav çar dewletêñ kolonyalist da hatiye parvekirin.

Wek tê zanin iro hema-hema hemû welatêñ koloni yên klasik, xwe ji nirê kolonyalizmê rizgar kirine. Lê mixabın ku Kurdistan yek ji welatêñ koloni yên heri dawin e. Nuha lı dînyayê dî nav komên gelên da, yên ku zîman û çanda wan dî binê zordestiyê da ne, Kurd dî rîza pêşin ci dîgrin. Dewletêñ ku Kurdistan dagir kirine, bî siyasetêñ kolonyali lı gelê Kurd zordestiyê dîkîn. Xasma lı Kurdistanâ Bakûr lı ser zîman û çanda kurdi siyaseteke

asimilasyonê ya pir hîşk tê ajotin.

Grûbêñ-zimanî yên azad, yan xwediyê dewleteke xweser in, (hetta wek grûbeke-zimanî, ereb xwediyê çend dewletan in) yan ji dî nav sinorê dewleteke pluralist -mesela federasyon- da bî hin gelên din ra tevayı dîjin. Lî deren weha, ziman û çandêñ cuda, bî qasi hev serbest û xwedi mecal in. Mesela lî Swisrayê, fransız, alman û italyan bî hevra, dî nav yekitiyeke siyasi-idari da dîjin. Zimanê hersê gelan ji zimanêñ resmi ne. Lê dî gelek rejim û dewletêñ cuda da, zimanêñ gelên bindest, minoritêtan, yan ji komên mîhacîr yên ku ji ber hin sedeman cîguhasti dibin, gelek caran dî bin xetera asimilasyon û zîmanguhastinê (1) da nîn.

## Asimilasyon

Dî ravekirina pêwendiyêñ (eleqet, dan û standin) navbera grûbêñ mayoritêt (pirani) (2) û minoritet (hûrgel) yên cîvatekê da -yan ji mîletêñ serdest û bindest da- gelek termêñ cuda têñ xebitandin. Peyva asimilasyon yek ji van e. Mesela ji bo ravekirina pêwendiyêñ navbera tîrkan (mîletê serdest) û kurdan (mîletê bindest), em gelek caran peyva asimilasyon bî kar tinin. Çı ye asimilasyon? Maneyêñ ferhengi yên gotina *asimilasyon* ev in: helandin; tunekirin; guherandin; integrekirin; wekhevkirin.

Bî ajotina siyaseteke asimilasyoni armanc ew e ku, grûba minoritêt (dî halê kurdan da gotina mîletê bindest rasttir e) bê bêgavkirin da ku şeklê jiyana xwe biguhurine, şêwe û usûla jiyana grûba mayoritêt -yan ji mîletê serdest- bîpejirine; huviyeta xwe biguhêse û êdi wek gel-grûb hebûna wi nemine.

Çawa tê zanin, asimilekirina xelkêñ welatêñ koloni, qedexekirina zimanê wan, nizim ditin û bicûk nişandana çand, erf û adetêñ wan, bi gotineke din qelskirin û tunekirina huviyeta wan a netewi, metodeki taybeti ye, ku hemû kolonyalistan bî kar aniye. Armanc, pêşilêgirtina şiyarbûna netewi û şerê rizgariya gelên bindest e. Û dî pêvajoya (proses) asimi-

lasyonê da, guhastuna zimanê gelê bindest, xasma pîrseke gîring e. Evê yekê mîrov hemahema di diroka hemû welatêñ koloni da dibine. Lê disa ji dîvê bê diyarkirin ku asimilasyon ne tenê fenomeneki kolonyalizmê ye. Helbet di gelek rejim û cîvatêñ cuda da ji mîrov dikare wê bibine.

## Asimilasyon û pirsa ziman

Ziman, bingehê kulturê ye, barkêşê kulturê ye; ew kulturê ji nîvşeki derbasi nîvşeki din dîke. Û ziman bî xwe ji miraseki kulturê ye heri gîring e. Dî jiyana mîleteki, yan ji grûbeke etnik da, rol û gîringiya ziman qet şik tune ku pir mezîn e. Hetta gelek caran ew dikare di hebûna mîleteki da rola heri mezîn bileyize.

Derbari rola ziman da, ronakbirê kurd ê mezîn Celadet Bedirxan weha dibêje:

*"Miletêñ bindest heyina xwe ji serdestêñ xwe bî du tiştan, bî qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Ziman dudo. Lê heke ola mîletê serdest û bindest yek bibe, hîngi çek yek bî tenê ye û bend tenê zuman e."* (3)

Îro, di pratika jiyana kurdan da mîrov rastiya vê tesbitê baştır dibine. Dewletêñ kolonyalist yên ku dest danine ser Kurdistanê, ew bî xwe ji wek kurdan musliman in. Lê dewletêñ zordest, vê yekê bî her awayi lî diji azadixwaziya gelê kurd; ji bo xapandinê, ji bo zulm û talanê bî kar tinin. Ew "biratiya xwe ya dini" bî ga-zêñ jehrê, bî bombeyêñ napalmê nişani gelê kurd didin. Mîrov dikare bî hêsanî bêje ku ev unsûra muşterek, dezavantajeke e ji bo kurdan.

Jî ber vê yekê, hebûna kurdan -wek mîlet- ji nêz va bî zimanê kurdi va girêdayi ye. Xasma dewleta tîrk, baş bî vê rastiyê hayedar e. Loma em dibinin ku hê dî roja-roj da bî qedexekirina zimanê kurdi dest bî karê asimilasyonê kiriye.

Dî pêşda em ê disa vegeerin ser vê pîrsê û ji hin aliyan va rewşa zimanê kurdi raçav bikin û wê bikisînin nav niqaşê. Mesela dî pêvajoya

asimilasyonê da rewşa zimanê kurdi çi ye? Dî nav kurdan da (lî Kurdistana Bakûr û Tîrkiyê) xetera zîmanguhastinê heye yan tune? Lî ser van pîrsan em ê bisekînn. Lê beri wê em dixwazin pîrsa zîmanguhastin- zimanparastinê di çarçoveyeke gîsti da raçav bikun.

## Faktorên ku dî guhastin yan ji parastina ziman da rol dileyizin

Faktorên ku dî guhastin yan ji parastina ziman da rol dileyizin gelek in. Herwisa dî navbera wan faktoran da pevgirêdaneye pirali û geleki kompleks (tevlihev) heye. Ne hêsa ye ku mirov her yekê ji wan, bî awaki serbixwe, rast û bê kêmasi şirove bike. Çimki yek tesirê lî ya dîn dîke. Giraniya rola her faktoreki dikare di her rewşeye cuda da, û ji bo her zimaneki cuda bîguhere. Ji bo kijan zimanî, kengê û kijan faktor rola bingehin dileyizin, ev yek bêtur bî saya lêkolinê zanisti dikare bê ronikîrin.

### Modelên teorik

Faktorên bingehin û têkiliyên navbera wan, ku dî cîvateke kırvıskırı da dîbin sedemê zîmanguhastinê, bî riya hin modelên teorik tê şirovekirin. Modelên teorik, dî hin rewşen berbiçav (konkret) da, ji bo pêşniyarkırına hin çareyên pratik yên diji zîmanguhastinê lazîm in. Lê belê, ew tu wextê nikarin sedi-sed bîbin kopyayêna rastiyê.

Heta nuha lî welatên Roavayê, dî literaturê da gelek modelên zanisti yên cuda hatine pêşkêşkirin. Dî vi wari da hertüm lêkolinênu ji çêdibin. Herçiqas ev modelana bêtur lî gor rewşa civatên endustriyê yên Roavayê bin ji, mirov dikare di analizkirina rewşa zimanê kurdi da ji, ji wan sûdê wergire. Çimki dî hemû modelan da hin prensibên gîsti û müşterek hene. Lê helbet rewşa zimanê kurdi; zordesiya

ku lî ser heye, ji gelek aliyan va, dî dînyayê da bê emsal e. Xasma lî Kurdistana Bakûr û lî Tîrkiyê, şertên ku zimanê kurdi têda diji, geleki spesifik in. Ji ber vê yekê, ji bo analizkirina rewşa zimanê kurdi xebatêna xweser hewce dikin.

Derheqa modelên hin civatên Roavayê da, em ê bî kurtebiri ci bîdîne ditinê du lêgerên iskandinavi: Kenneth Hyltensdam û Christofer Stroud (4). Wan lî ser rewşa zimanê gelê sami (5) lêkolineke fire kirine. Lî gor van lêgeran, mirov dikare hemû modelên heyi, yên ku heta nuha di literaturê da ci girtine, kom bike û dî nav sê kategorîyan da ji hevdu vejetine:

### 1. Modelên ku bûyera zîmanguhastinê di perspektiveke civaki da dibinin:

Dî van modelan da, xasma şertên demografik û abori (ekonomik) yên grûba minoritêt -yan ji miletê bindest- geleki gîring têna ditin. Herwisa kijan sazgehêna zimanî yên gîring di destê grûba minoritêt hene; balansa quwetê di navbera grûba mayoritêt û minoritêt da çawan e; ditina grûba mayoritêt derheqa grûba minoritêt da çi ye -ango bî ci çavi lî grûba minoritêt mêze dîke? Esas tiştên gîring ev in.

### 2. Modelên ku giraniyê didin ser pevgirêdana faktorên civaki û tewrê konkret yên ferdan (kesan) bî hevra:

Lî gor van modelan tiştên gîring ev in: Wargêyan ji dorhêla ku zimanê grûba minoritêt têda tê bikaranin; tevnîn civaki yên cuda ku endamên wi zimanî ji têda ci digrin, huviyeta wan û tewrê wan lî hember zimanê kal û bavan; tewrê endamên grûba mayoritêt li hember grûba minoritêt. Ev tiştana xelekên zincira navbera faktorên civaki û şertiên konkret yên tercihkîrina ziman pêk tinin.

### 3. Modelên ku giraniyê didin ser guherandinê struktura zuman û ehliyeta ferdi ya endamên grûba minoritêt ku dî prosesa zîmanguhastinê da peyda dîbin.

Hyltenstam û Stroud, tevdîr û çareyên ku ji ali van modelan va têna pêşniyarkirin, bî kurti

weha rêz dîkin:

Mesela li gor modelên kategoriya 1. (faktoren civaki), tevdîrên wisa têن pêşniyarkırın ku, bî saya wan zimanê grûba minoritêt bikaribe di gelek waran da û bî awayeki fire belav bibe û bê xebitandin. Ev ji bî riya guhartin, yan ji serrastkirina qanûnêñ ku derheqa zimanê grûba minoritêt hene, pêktê.


Tevdirên ku ji aliyê modelên kategoriya 2. (faktoren sosyalpsikolojik) têن pêşniyarkırın, bêtur berê xwe didine pêwendiyên civaki û tewrê kesan. Mesela gereke di nav endamên grûba minoritêt da xwenasi, xiret û suûra grûbi bê zêdekurin, û herwisa bî riya informasyonê, û bî awayên din tesir li endamên grûba mayoritêt bê kîrin, da ku ew ji tewrê xwe li hember grûba minoritêt biguhurinin û baştir bikin.

Modelên kategoriya 3. berê xwe didin tevdîrên wisa ku rê li ber qelsbûna û jarbûna ziman bigrin. Da ku endamên ziman, ehliyeta xwe ya xebitandina ziman çétür bikin. Mesela bî riya perwerdegariyê, mekteban û hwd. Herwisa tekûzkîrin û standartkirina ziman ji di vi wari da tevdireke muhim e. (6)

Çawa ku Hyltenstam û Stroud ji rave dîkin, di navbera modelên her kategoriyeke da ji gelek ferq û cudayı hene. Esasen feyde têda heye, lê mixabin em ê nikaribin lî vêderê, lî ser hin modelên cuda yên van hersê kategoriyan bisekinin. Babeteke fire ye. Lê disa ji em ê bêyi salixdana modela sosyolog-zimanzan M. Tandefelt, derbas nebin.

Jî ber ku Tandefelt, faktoran di çarçoveke firetur da digure dest xwe. Ew giraniyê nade tenê faktoren pêngaveki. Hemû faktoran di nava du koman da dabeş dike: Faktoren sosyokulturel û yên lingvistiki. Ev herdu bî hevra, di hemû dereca da (civaki, grûbi û ferdi) rol dileyizin. Giraniya rola van faktoran herdem ne mina hev e, di zemanên cuda da tesira wan ji diguhure.

Lî gor vê modelê, di pêngava civaki da, qanûnêñ siyasi yên derheq ziman da; sazgeh,



Faktoren sos-yokulturel      Faktoren lingvistiki

*Figur modela Tandefelt bi kurti ravedike*

enstitusyon (mekteb, dêr, kultura gîrsi û hwd.) wek faktoren gîring yên ziman-guhastinê rol dileyizin. Tandefelt, faktoren pêngava grûbi ji weha ji hev vediqetine:

- a) Faktoren ku bî ditin û raya grûba mayoritêt va girêdayi ne.
- b) Faktoren ku bî rewşa grûba minoritêt va girêdayi ne, wek: demografi, nexşê ciwarbûna grûbê, xusûsiyetên kulturi û peydabûna kesên duzimani di nav grûbê da û hwd. (7)

## Faktoren gîsti yên ku dîkarin hemû modelan hembêz bikin:

Gelek kesên lêger-niviskar, faktoran di sê pêngavêñ (derece) cuda da dibinin. Pêngava civaki, ya grûbi û ya ferdi. Mirov dikare bêje ku ev perspektiveke gîsti ye. Mesela ji lêger-niviskarêñ iskandinavi, M. Tandefelt, Kenneth Hyltenstam û Christofer Stroud van faktoran (bî hînek ferqên biçük) wek hev rêz dîkin. Ev variantê ku em li jêrê pêşkêş dîkin,

yê K. Hyltenstam û C. Stroud e. Herdu niviskar dî lêkolina xwe ya ser rewfla zimanê sami da, wek metod, faktoran li gor vê rêzkirinê digrin destê xwe û bî wi awayi tesira faktoran li ser imkanên parastina zimanê sami dihêjinin (bî qimet dikin). Dî dawiya lêkolina xwe da, ew rola her faktoreki li gor pozitivbûn, negativbûnê bî nişanê (-), (+), û him pozitiv him ji negativbûnê ji bî nişana ( $\pm$ ) dîdîn diyarkirin. Ev metod, wek nûmûneyekê dikare dî lêkolinê ser rewşa zimanê kurdi da ji bibe alikari.

### Faktorêñ dereca civaki :

*Sertêñ siyasi yên legal (Siyaseta dewletê)  
İdeolojiya piraniyê (yan ji ideolojiya miletê serdest)*  
*Dî qanûnê da destûra ziman  
Mecalêñ realizekarinê  
Faktorêñ ekonomik  
Normêñ civaki-çandi (Sosyokulturel)  
Perwerdegari (Dibistan, hindekari, talim û terbiye)*

### Faktorêñ dereca grûbi:

*Demografi  
Mezinahi  
Navça dendik (Devera esasi ya ziman)  
Rewşa zewacê (ji gelên din dan û standina jinan) û hwd.  
Sertêñ zimanê bindest  
Zimanê resmi  
Zimanê resmi li welateki din  
Li hin welatên din tê qisekirin  
Zarav (dialect) û belavbûna ziman  
Standarkarin û nûjenkirina ziman  
Hoyêñ navbera zimanê xwendin û zimanê nivisandinê  
Bi du zimani bûn  
Hakimbûna li ziman (baş zanina zimanê dê)  
Heterojeni / homojeni  
Cureyê etniki,  
Ekonomi / debar  
Organizasyon / rêxistinêñ hundirin  
Sazgehêñ xwerû  
Perwerdegari, xwendin, dibistan  
İbadetxane (cami, dêr û hwd.)  
Bernama ziman  
Lêkolin û çand*

*Medya (Rojname, radyo û TV)  
Çalakiyêñ kulturi*

### Faktorêñ dereca ferdi:

*Tercihkarina ziman  
Sosyalizasyon (Bî zarokan ra qisekirin û hinkirina wan bî zimanê dayikê) (8)*

### Têbini û çavkani:

- (1) Peyva "zimanguhastin" dikare bê van maneyêñ han: guhastina ziman, windakirina ziman, kuştina ziman, jibirkirin yan ji birkirindayina ziman. Peyva zimanparastin ji dikare bê maneyêñ hevrikê van gotinan.
- (2) Herçiqas maneya mayorîtêt "pirani" ye ji, li vir dî şûna piraniyê da "miletê serdest" tê qestkirin. Çimki miletê serdest herdem piraniyê pêk nayne.
- (3) (C. Bedirxan, Hawar, hej. 20. Heyineke yeksalı)
- (4) K. Hyltenstam - C. Stroud, nuha li Universita Stockholmê dî warê ziman da wek lêkolinevan xebata xwe dîdominin.
- (5) Gelê sami (laponi) geleki kevn in li bakûrê İskandinavyayê dijin. Welatê wan dî navbera Norveç, Swêd, Finlandya û Rûsyayê da parçekiri ye.
- (6) M. Tandefelt, Mellan två språk. En fallstudie om språkbevarande och språkbyte i Finland.
- (7) K. Hyltenstam - C. Stroud, Språkbyte och Språkbevarande om samiskan och andra minoritetsspråk, Lund 1991)
- (8) Eyni berhem.

*Siyaseta asimilasyonê ya dewleta turk û rewşa zimanê kurdi*

*Dî hejmareke din da*

# Sinan Ji Bo Zarokan

Gotin û Muzik : A. GERNAS  
Amadekarê nota : Ferid Nadhar

1

Demsal

2

Kanûn, Çile û Sıbat  
Demsala zıvistan hat  
Berfê sıpi kır axê  
Serma bî ser me da hat.

Adar, Nisan û Gulân  
Bîhar lî deşt û çiyan  
Gul û nêrgiz û çiçek  
Vedijeninin jiyan.

3

Heziran, Tirmeh, Tebax  
Havin e germ dibe ax  
Zer dibe ceh û genim  
Mışmiş sor bûne lî şax.

Ilon, Cotmeh û Avdar  
Dîweşin tev pelên dar  
Payiz e ba dîke vizin  
Axê radîkin cotkar.

4

MODERATO :

" Demsal "

2  
4  
Ka nûn Çi le û Sı bat Dem sa la zi vis tan hat

2  
4  
Ka nûn Çi le û Sı bat Dem sa la zi vis tan hat

2  
4  
Ber fê sı pi kır a xê Ser ma bî ser me da hat

2  
4  
Ber fê sı pi kır a xê Ser ma bî ser me da hat

1

**Hevalê Mîn**

2

Hevaleki mîn heye  
 Meriv tîm pê bawer e  
 Hevaleki mîn heye  
 Jî bo mîn tîm piştgir e  
 Hevalê mîn heval e  
 Hevalê mîn hêja ye.

Jî hevalê xwe razi me  
 Jî ber ew mîn şâ dîke  
 Hevalê mîn bî çik e  
 Derd û şahi par dîke  
 Hevalê mîn heval e  
 Hevalê mîn hêja ye.

3

Ez û te hevalê mîn  
 Bî hevra gelek xurt ìn  
 Ez û te hevalê mîn  
 Tu dîjwari nas nakîn  
 Hevalê mîn heval e  
 Hevalê mîn hêja ye.

4

Hevalti çıqas xweş e  
 Ger tunebe xapandin  
 Hevalti çıqas xweş e  
 Ger herdem be hezkîrin  
 Hevalê mîn heval e  
 Hevalê mîn hêja ye.

ALLEGRO :

**Hevalê Mîn**

He va lê mîn he va le he va lê mîn hê ja ye

He va lê mîn he va le he va lê mîn hê ja ye

He va le ki mîn he ye Me riv tîm pê ba we re

He va le ki mîn he ye Jî bo mîn tîm pişt gi re

## Ez zarok im pırs dıkım

1

Bı naveki têm nasin  
Bo mın bûye tırsa jin  
Jı rengeki hez dıkım  
Nikarım xwe nêz bıkım

**Ez zarok im pırs dıkım**  
**Ev çı iş e fam nakım.**

2

Dilanên ez dileyzim  
Jı mın hatine dızin  
Stranên ez dıxweynim  
Jı mın hatine dızin

**Ez zarok im pırs dıkım**  
**Bo çı dizi?.. fam nakım**

3

Zımanek dıpeyivim  
Nikarım bınıvşinim  
Lı wenatek rûdînem  
Nikarım bı nav bıkım

**Zarok im qebûl nakım**  
**Tırs û zorê nas nakım**  
**Dıxwazım xwe nas bıkım**  
**Xwe bê tırs bı nav bıkım.**

ALLEGRO :

" Ez Zarok im Pırs Dıkım "

The musical score is in G major, 2/4 time. It features four staves of music with lyrics underneath each note. The lyrics correspond to the three parts of the song:

- Part 1: Ez za rok im pırs di kim  
Ev çı i şe fam na kim
- Part 2: Ez za rok im pırs di kim  
Ev çı i şe fam na kim
- Part 3: Bi na ve ki têm na sin  
Bo mın bû ye tırs a jin
- Part 4: Ji ren ge ki hez di kim  
Ni ka rim xwe nêz bı kim

# Tu zulm níkare emrê kolonyalizmê dîrêj bîke!



## B. Dersim

Rojnama AZADI, dî roja 13'ê Gulanê de ji ali Dadgeha Ewlekari ya Dewletê li İstenbolê hat girtin. Li gor qanûna 3713 'an ya "têkoşina hember terorê" AZADI hat cezakîrin ku 15 rojan dernekeve.

Lê ev ne cezayê pêşin e. Rojnama Azadi mina rojnameyên kurdi yên din heya nuha bû mixatabê gelek zordarı û neheqîyan.

AZADI dî 17'ê Gulanê sala 1992'an da dest bî jiyana weşanê kîr. Heya roja girtinê wek rojnama hefteyi 104 hejmar derxist. 66 hejmârên wê bî riya dewletê hatin komkürin û derheqa mesûlên wê da dawe hatin vekîrin.

Lî ser hev jî bona mesûlên rojnamê nêzi 50 sal cezayê hepsê û 15 milyar ji cezayê peran tê xwestin.

Daweyênu ku gîhiştine dawi jî bona xwedi û mesûlê rojnamê 11 sal cezayê hepsê û 3 milyar ji cezayê peran hatiye dayin. Bona girtına rojnamê ji 4 biryarêne mehkema bilind hene.

Iro ji xwedyiyê rojnamê yê berê H. Çetin û mesûlê rojnamê Zana Sezen dî girtigehê da ne.

Nûçegihanê (muxabir) Mazidaxê Sait Erten dî roja 3'ê Çırıya paşin 1992'an da jî ali qontrgeilla ve hate şehidkirin.

Niviskar û xwendevanê rojnamê ji jî zordesiya dewletê para xwe girtin.

Bî hemû van êriş û zordestiyan, dewletê xwest ku hêz û piştgiriya ku rojname ji gel distine qut bike. Lê daxwaza wan bî ser neket. Azadi'yê dî mal û dilê hezaran da jî xwe ra cih stend.

Wek tê zanîn xasima bî rejîma faşist di 12'ê İlône de zulmeke gîran dî ser gelê me da hat. Ew roj bû destpêka rojîn reş. Xebat û çalakiyên demokratik wek sîc hatin ditin. Gelê kurd gelek bedêl da û xwe gîhand vê rojê. Lê êdi roj jî aso derket. Dî cihêneren windakîri da tovîn nû bejn dan û têkoşin girtin ser milêne xwe.

Azadi yek jî wan tovîn nû ye, ku iro dî nava gel da kok daye û dî şerê rizgariyê da ciheki taybeti distine.

Azadi li hember şer û barbariya ku lî ser gelê kurd pêk tê derket û ew raxist ber çavê gelê Tîrkiyê û cihanê. Wê dî rûpelên xwe da pirs û daxwazên gelê kurd ani zman, pêşniyar û riyên çareserkirinê rawa kîr. Bî hezaran kes bî saya Azadiyê jî pirs û problema gelê kurd agahdar bûn.

Azadi'yê cih da zman, dirok û çanda kurdî. Jî bona parastin û pêşkêşkirina wan xebiti. Bî sedan, bî hezaran kes jî bona fîrbûna zmanê kurdî jê hewas û piştgiri stendin.

Dî vê xebata hêja da, xwendevan, niviskar û xebatkarêne rojnamê cûre-cûre xwedi par in. Jî xwe piştgiriye bî hevra nebe dî vi kari da serkevtin zahmet e. Karê weşanen kareki kolektiv e. Ew dişibe avakîrina avahiyekê. Wexta meriv bixwaze malekê av bike, dîvî jêra xebateke tevayı û kûr bê kîrin. Dî karê han da xebat pûralî ye. Lazîm e her tuş dî cih da û lî gora pivanê be. Bingeh li gor av û hewa-iqlimê welat bê danin. Usa nebe xani li ber ba û bahozê, li ber

hejandinekê nîkare xwe ragire. Xasîma di Kurdistana iro da ew tofan gelek in. Lî xuya ye ku xebatkarê Azadi'ye ew tişt rind dane ber çavan. Angori qanûn û metodêne demokratik du salan rojnameke mina Azadi dane jiyanđin.

Hikûmata tîrk gelek wext e ku qala "naskırına realita kurd û mafêne demokratik" dike. Lî heta nuha tu guhartinê berbi çav çênebûne. Serda ji ew mînaqêsekirina pîrsa kurdi, azadi û demokrasiyê, lî diji derketina zordestiya ser gelê kurd wek teror dihesibinin.

Zagona esasi, ya ku cûnta faşist çêkir, bî salan e ku xebata jî bona azadi û demokrasiyê bend dike. Dewleta tîrk bî vê ji qima xwe neani. Qanûna 3713 ya bî navê "qanûna tekoşina lî hember terorê" derxist. Ev qanûna hanê, xasîma jî bona cezakirina welatparêzêne kurd cezayên gîran tîne.

Lî gor vê qanûnê, dijderketina gelê kurd lî hember neheqi û zordestiya netewi, teror e. Hemû xebatêna aştixwaz û humaniter; xebatêna lî ser çand û diroka kurdî dî vê çarçovê da tê şirovekîn û cezakirin. Dî eslê xwe da qanûn bî xwe teror e û lî hember têkoşina gelê kurd hatiye derxistin. Lî gor vê qanûna han, behskirina zulma lî ser gelê kurd, talankirina gund û bajaran; behskirina parti û rîxistinêne kurdî, weşandina weşanê kurdî terorizm e!.

Wek me lî jorê da xuyakîrin, rojnama AZADI û rojnameyêne kurdî Özgür Gündem, Mediya Güneşi û yên din, lî gor vê qanûnê hatîn cezakirin. Hin tiştêne xapinok bêne gotin ji, zordestiya lî ser gelê kurd û çanda wi berde-wam e. Lî Kurdistanâ Bakûr 20 milyoni zêdetir kurd diji. Lî bî zîmanê xwe derxistina pîrtûk, rojname û kovaran an ji xwendin û belavkirina wan qedexe ye. Zîmanê kurdî, di radyo, TV û dibistanan da qedexe ye. Rojnameyêne ku iro derdikevin ji gelek fedekari dikin û bedêl dîdin. Gelek rojnamevanêne kurd bi destê dewletê hateine kuştin. Mûsa Anter, M. Sait Erten, Huseyin Deniz û gelek welatparêzêne din bi xwina xwe hêz dane xebata lî diji dijmin.

Dewleta tîrk çîma evqas bî barbari dajo ser gel û çanda me?

Helbet ev yek bêsebeb nine?

Bona ku zîman û çand, dî hûnandina forma milleti da du faktorêne esasi ne. Heke jî wan

yen kêm be, gora pivana ilmî millet ji mana xwe wînda dike. Şikîlgirtina ruhi ya milleti bî riya çandê xwe tîne zîman. Wexta ku yekitiya zîman û çandê tune be, ew gel wek milleteki nayê hesibandîn..

Bona vê ji koloniyalist bî qesit hewîldidin ku gelê kurd bê zîman, bê çand û bê dirok bîdîne naskırın. Em ji dixwazîn derewen wan pûçkin. Loma weşandina weşanê kurdî dewlet ji xwe ra xeter dîbîne.

Ajitasyon propaxande parçek ji şer e. Wexta ku bî hostatî bê karanîn tesir û rola xwe mezin e. Dewlet xwedi gelek sazgeh û quwet e. Pir caran çewti û derewan wek xeberêne rast dîde û milyonan kesi qane dike. Bûyerênu ku lî Kurdistanê dîqewimîn, lî gor menfaeta xwe ya millî şirove dike û gel dixapine.

İmkân û olaxêne gelê kurd dî vi wari da bî sînor in. Yêneyi ji dewlet bî gelek qanûn û metodêne eskeri ve dajo ser, û rî nade ku gelê kurd bî çavkaniyêne xwe xeberêne rast bigire.

Lî Kurdistanê şer gurr dibe. Hezaran gund hatîne valakîrin. Bî milyonan insanê me erdê bav û kalan terkandine. Dî roja iro da gel zêtir hewceyi saziyên siyasi û çandi ye.

## ROJNAMA AZADI ŞÜNA XWE DA DENGÊ AZADI

Hêzêne welatparêz û azadixwaz meydanê ji dîjmin ra naterîkinin. Di 20 ê Gulânê de bî navê Dengê Azadi, rojnameyeke din xebata AZADI'ye dewr girt. Dengê Azadi'ye bi saya tecrube û xebata Azadi'ye xebata xwe wê xurttur rîva bibe.

Em dîzanin rojnameyek ne hemû tişt e. Lî xebatêna çapemeniyê ji dî têkoşina azadiyê da xebatêna hêja ne. Divê welatperwerêne kurd per û baskêne xwe lî ser çapemeniya kurd ra bîgrin, da ew bijin, lî ber ba û bahozan netemirin. Qanûn û metodêne ku lî hember gelê me hatîne karanîn, nekarin pêşî li xebata azadi û rîzgariyê bîgrin. Nuha şûnda ji tedbir û astengen ku bî darê zorê têne girtin, nikarin pêşî li xebata gelê me bigirin. Tu zîlm nikare emrê kolonyalizmê dirêj bîke!

Rojnama AZADI

Kurda derxist bî serbilindi  
gîhişt hejmara sedi

Dara mezîn lî nav gundi  
zarok û zêç lî bin te dîlizi

Hawar û gaziya me dîbhizi  
hejmara pêşî heta dawi

Kurdistan jî dûr tani nêzi  
mîn xwend bî kêf û giri

Da bîxwinin Azadi  
Hemfikir bin jî bo yekiti

Sed car spasdari  
jî bo xebatkarên AZADI!

Xoşnav ÇIYAYI / Borlänge- Swêd

# DERKET!



Dengê gelê kurd e.

Bîbe abone,  
piştgiriyê bike!

Bîxwine, bide xwendin!

## Cihê ağır

Çanda me hêtûnek e  
dî hêtûnê da ağır çırûsk dîde  
Jî şewatê dû hiltê, ku mirovan berbî xwe  
dîkîşine

Pifi ağır bîke  
bîla venemire!  
Tevde ku geştir bîbe, ronahiyê bîde!  
Êzing û qırşan bavêje ser  
da ku pêtên wê bikarbin me germ bikin  
û çanda me bîdîn jiyandin!

(Paulus Utsi)